

Karl Marx  
Friedrich Engels

# Manîfestoya Partiya Komunîst

Werger: Tongu Ok

Teori

EVRENSEL  
BASIM  
YAYIN



KARL MARX - FRIEDRICH ENGELS • MANİFESTOYA PARTIYA KOMUNİST





**EVRENSEL**  
BASIM YAYIN



**Navê Pirtûkê yê Orîjînal:**

'Manifesto of the Communist Party' by Karl Max and Engels.  
Autharized English Translation: Edited and Annadaded by Frede-  
rick Engels, Chicago, Charles it. Karl & Compony.

KARL MARX - FRIEDRICH ENGELS

---

---

**Manîfestoya Partiya Komunîst**

---

---

WERGER: TONGUÇ OK

TEORİ

---

**DOĞA BASIN YAYIN**

Dağıtım Ticaret Limited Şirketi

Tarlabası Blv. Kamerhatun Mah. Alhatun Sk. No: 25 Beyoğlu / İstanbul

T: 0212 255 25 46 F: 0212 255 25 87

[www.evrenselbasim.com](http://www.evrenselbasim.com) - [info@evrenselbasim.com](mailto:info@evrenselbasim.com)

---

**Evrensel Basım Yayın 421**

**Rêza Pirtûkên Kurdî 7**

**Manîfestoya Partiya Komunîst: Karl Marx - Friedrich Engels**

**Wergêr: Tonguç Ok**

**Redaksiyon: Emîn Gurban**

**Tîprêzî: Delal Kazici**

**Dîzayna Bergê: Savaş Çekiç**

**Amadekirina Bergê: Devrim Koçlan**

**ISBN 978-605-4156-62-7**

**© Evrensel Basım Yayın 2011 - Sertifika No 11015**

Çapa Yekemîn Gulan 2011

---

Çap: Ezgi Matbaası

Sanayi Caddesi Altay Sokak No: 14 Çobançeşme - Yenibosna / İstanbul T:

0212 452 23 02 - 654 94 18 - [ezgimatbaa@myinet.com](mailto:ezgimatbaa@myinet.com) - [www.ezgimatbaa.net](http://www.ezgimatbaa.net)

---

---

---

# **Manîfestoya Partiya Komunîst**

---

---

## Ji Wergêr:


Min ev berhem ji çapa Îngilizî ya ku di sala 1888'an de bi edîtorîya Frederîck Engels hatiye weşandin wergerand. Hevalê min ê hêja Emîn GURBAN werger di ber çavan re derbas kir, çewtiyên min sere-rast kirin, bi pêşniyazên xwe yê giranbuha rê nîşanî min da û gîyanê kurmanciyê da wergerê. Ku ji aliyê zimên ve wergereke zelal derke-tibe holê em vê yekê ji hevalê Emîn re deyndar in. Heçî kêmasî ne, ji wan ez berpirsyar im. Xebatek nîn e ku bêyî kêmasî be. Digel vê yekê em di wê baweriyê de ne ku me wergereke baş pêşkêşî xwendevanan kiriye. Bêguman biryara herî rast, a wan e.

*Tonguç Ok*

# NAVEROK

Pêşgotin .....	11
I. Bûrjûva û Proleter .....	21
II. Proleter û Komunîst .....	34
III. Lîteratûra Sosyalîst û Komunîst .....	44
1. Sosyalîzma Paşverû .....	44
a) Sosyalîzma Feodal .....	44
b) Sosyalîzma Burjûvaziya Biçûk .....	46
c) Sosyalîzma Alman an jî Sosyalîzma 'Rastîn' .....	47
2. Sosyalîzma Kevneperest an jî Sosyalîzma Burjûva .....	50
3. Sosyalîzm û Komunîzma Rexneyî-Utopîk .....	51
IV. Helwesta Komunîstan a li Hemberî Partiyên	
Dijber ên Cihêreng .....	55







# PÊŞGOTIN<sup>1</sup>

“Manîfesto” wekî platforma “Yekîtiya Komunîst” hate weşandin. Yekîtiya Komunîst di destpêkê de rêxistineke Alman, paşê rêxistineke navneteweyî [enternasyonal] û di mercên siyasî ya Parmezinê<sup>2</sup> ya beriya sala 1848’an de jî bi vî navî rêxistineke nepenî bû. Di meha Sermaweza 1847’an de, di kongreyeke Yekîtiyê ya ku li Londrayê hate li dar xistin de, Marx û Engels bi amadekirina Gernameyêke partiyê ya ji hêla teorîk û kardarî [pratik] ve bêkêmasî hatin peywirdarkirin. Destnivîs di meha Rêbendana 1848’an de hildan penûsê û çend hefteyên beriya Şoreşa Fransîz a 24’ê Reşemiyê ji çapxaneyê li Londrayê re hate weşandin. Wergereke wê ya Fransîzî hema beriya Serhildana Pûşperê (1848) li Parisê hate weşandin. Wergera yekemîn a bi Îngilîzî ji aliyê Miss Helen Macparlane ve hate kirin û di “Red Republican” [Komarparêza Sor] a George Julian Harney de hate weşandin. Her wiha wergerek Dankî û ya Lehkî ji hatin weşandin.

Têkçûna serhildana Pûşperê ya li Parisê (1848) -di navbera proleterya û burjûveziyê de lêkdana yekemîn a mezin e- keserên civakî û siyasî yên çîna karkeran a Ewropayê dîsa ji bo demekê paş ve avêt. Jê pê de têkoşîna ji bo serdestiyê, wekî beriya Şoreşa Reşemiyê, dîsa bi tenê di navbera beşên cuda yên çîna xwedî milk de dom kir. Çîna karkeran bi têkoşîna ji bo serbestiya tevgerê ya siyasî

---

1 Ev pêşgotin ji bo çapa Îngilîzî (1888) ji aliyê Engels ve hate nivîsandin. [t.w.]

2 Parzemîn: Parzemîna Ewropayê ya ji bilî gravên Britanyayê. [t.w.]

û bi derawaya bûyîna bera çep a Radikalên çîna navîn hate bisînorkirin. Li her dera ku tevgerên proleter ên serbixwe amajeya jiyane nîşan dan, ew tevger bi hovane hatin çewisandan. Nexwe polîsên Alman da pey Lijneya Rêveberiya Navendî ya Yekîtiya Komunist a ku wê demê li Kolnê bû. Endam hatin girtin û piştî girtûbûna bi hejdeh mehan di meha Kewçêra sala 1852'yan de, darizandina wan destpê kir. Vê "Doza Komunistên Kolnê" ya ni bi nav û deng ji 4'ê Kewçêrê heya 12'ê Sermawezê dom kir. Heft kesên ji girtiyan cezayên girtina hundirê kelehê [kelebendî] yên ku di navbera sê û şeş salan de diguherin xwarin. Piştî darizandinê Yekîti ji aliyê endamên mayîn ve hate fesixkirin. Heçî "Manîfesto", jê pê ve wisa dixuya ku dê ew çarneçar bihata ji bir kirin.

Gava ku çîna karkeran a Ewropayê ji bo ji nû ve êrîşkirina bi ser çîna serdest de bi qasî ku têr bike bi xwe ve hat Yekîtiya Navneteweyî ya Karkeran [Enternasyonal] saz bû. Lêbelê vê yekîtiya ku bi armanca komkirina di bin saziyekê ya hemû proleterya ya Ewropayê û ya Amerîkayê hat damezrandin, di destpêkê de nekarî rêgezên ku di "Manîfesto"yê de hatin derpêş kirin binine zimên. Pêdiviya Enternasyonalê bi bernameyeke têr berfireh hebû, da ku sendîkayên Îngilîz, alîgirên Proudhanî yên li Fransa, Belçîka û Îspanyayê û Lassallyan<sup>1</sup> ên [alîgirên Lassalle] li Almanyayê, wê bipejirînin. Marx ev bername bi şeweyekî ku dê ji aliyê hemû partiyan ve bê ecibandin nivîsand. Wî bawerîya xwe bi pêşketina ramanî ya çîna karkeran anî bû. Bêguman ev pêşketin dê di enca ma çalakiya yekgirtî û niqaşên beramber de pêk bihata. Bûyer û rewşên cur bi cur ên di têkoşîna li dijî sermayeyê de, têkçûnên ku ji serkeftinan zêdetir in, der barê şelaqiyên cur bi cur ên ku mirov pê ve hatine girêdan de, wê zanebûna mirovan pêk bine û riya rastîn a xilasiya çîna karkeran bi temamî bi wan bide fêm kirin. Û Marx mafdar derket. Gava ku Enternasyonal di sala 1847'an de pelîşiya,

1 Lassalle bixwe her tim xwe wekî şagirtê Marx bi me dida nasîn û li cem me rêgezên "Manîfesto"yê diparastin. Lêbelê di ajitasyonên xwe yên li ber civakê de ji daxwaza kargehên koperatîfên ku bi qrêdiya dexwletê tîn piştgiri kirin pêş ve neçû. [Têbîna Engelsî]

karkerên ku wê li pey xwe hiştin ji yên ku wê di sala 1864'an de ditûbûn gelek cûda bûn. Li Fransayê Proudhanîzm, li Almaniyayê ji Lassallîzm li ber mirinê bûn. Sendîkayên Îngilîz ên kevneperest jî her çiqas têkiliyên xwe yên bi Enternasyonalê re ji mêj ve biribin jî bi bereberetî pêş ve diçûn û gihîştin wê radeyê ku serokên wan par li Swonseayê wiha got, "Sosyalîzma Parzemînê ji bo me hew tişteki, sawnak e." Bi rastî jî rêgezên "Manîfesto yê di nav karkerên hemû welatan de pêşveçûnên pirkî, pir nîşan dan.

Bi vî awayî "Manîfesto" dişa derket pêş. Nivîsara Almanî gelek caran li Swîsre, Îngilîstan û Amerîkayê hate çapkirin. Di sala 1872'yan de li New Yorkê bi Îngilîzî hate wergerandin û di rojnameya hefteyî ya bi navê "Woodhall and Claplin's Weekly" de hate weşandin. Ji vê nivîsara Îngilîzî ji bo Fransîzî hate wergerandin û di rojnameya "La Socialiste" de hate weşandin. Jê pê ve du wergerên Îngilîzî yên kêr û zêde têkdayî li Amerîkayê hatin weşandin û yek ji wan li Îngilîstanê ji nû ve hate çapkirin. Wergera yekemîn a Rûsî ji aliyê aliyê Bakunîn ve hate kirin û di salên 1863'yan de li Cenevreyê, di nivîgeha "Kolokol" a Herzenê de hate weşandin. Wergera duyemîn a Rûsî dişa li Cenevreyê ji aliyê Vera Zasuliç a egîd ve di sala 1882'yan de hat weşandin. Çapa nû ya Dankî ji aliyê "Socialdemokratist Dibliothek" [Pirtûkxaneya Sosyal-Demokrat] ve li Kopenhagê di sala 1885'an de hate çapkirin. Wergereke teze ya Fransîzî di sala 1886'an de li Parîsê di "La Socialiste" yê de derket. Piştî vê wergera dawî, ji bo Spanolî wergerek hate amadekirin û di sala 1886'an de li Madrîdê hat weşandin. Hejmara çapên nû yên Almanî nayê zanîn lê bi kêmanî duwazdeh çap hene. Wergereke wê ya bi Ermenkî li Stenbolê dê bihata çapkirin; lêbelê bi qasî ku ez dizanim weşanger jî çapkirina pirtûkeke ku li ser wê navê Marx heye ditirse wergêr jî nîşandana pirtûkê wekî berhema xwe napejirîne û ji ber vê yekê pirtûk nayê weşandin. Min bihîst ku wergerên bi zimanên din jî hene, lêbelê min ew bi çavê xwe nedîtin. Nexwe diroka "Manîfesto" yê bi piranî diroka tevgera çîna karkeran a nûjen dide nîşandan. Bêguman ew niha berhema herî belavbûyî û herî navneteweyî ya lîteratûra sosyalîst e; û ji Sibîryayê

bigire heya Kaliforniyayê ji aliye bi milyonan karkeran ve weki platforma hevpar te pejirandin.

Dema ku ew hate nivisandin, me je re hej nedigot Manifestoya Sosyalist. We demê gava peyva sosyalist hate bilêvkin ji aliyekî ve sistemen utopik ên cihêreng -li Ingilistanê Owestist û li Fransayê Fourerist, ku her du ji bi tenê mezhebên li ber mirinê bûn-, ji aliye din ve ji çaçûlên civakî yên ku cambaziyên gotinan ên ji her cureyî angaşt dikin ku beyî sermaye û desketî (kâr) bikevin talûkeyê de ew hemû eş û janên civakî ji holê rakin; ango di her du rewşan de ji yên ku derveyî tevgera çîna karkeran in û zêdetir li piştgiriya çînen "hêvotî" digerin dihatin hişê mirov. Di nav çîna karkeran de yên ku bi nebesatiya bi tenê şoreşeke siyasî qanî bûn û diviyatiya veguhêraneke civakî himî diajotin pêş, xwe weki komunîst bi nav dikirin. Ew komunîzmeke xam, nebaş tiraşkirî û bi tevahî dozîni bû. Lêbelê dişa ji li nuxteya meseleyê diket û di navbera karkeran de bi qasî ku bikaribe komunîzma utopik (li Fransayê ya Cabetî û Almaniyayê ya Weitling'î) biafirîne, xurt bû. Nexwe di sala 1847'an de sosyalîzm tevgerêke çîna navîn, komunîzm tevgerêke çîna karkeran bû. Sosyalîzm qet nebe li Parzemîne "rêzdar" bû; komunîzm bereveji. Ji ber ku ji destpêkê pê de bi ditina me "divê rizgariya çîna karkeran berhema çîna karkeran bi xwe be", der barê navê ku em ê ji xwe re hilbijêrin de şik û guman tune bûn. Bi ser de, je pê de ji em li mandelekirina vî navî qet nefikirin.

Her çiqas Manifesto berhema me herduyan be ji divê ez diyar bikim ku qediyeya bingeh a ku puxtêya wê pêk tîne aîdî Marx e. Qediyeya navborî ev e: Di her heyama dirokî de awayê hilberin û danûstandinê û weki encama jênerêvîn a wê yekê birêxistinbûna civakî bingehê pêk tînin. Diroka siyasî û ramanî ya wê heyamê li ser vê bingehê ava dibe û tenê bi vê bingehê ve dikare bê ravekirin. Lewma hemû diroka mirovahiyê (ji pelişîna civaka seretayî ya babistîni pê ve -ku tê de erd xwedaniya hevpar a civakê bû) diroka têkoşîna çînan e; diroka pêvçûnên di navbera çînen serdest û bindest de ye. Ev têkoşînên çînan di rêzeyeke peresanan re derbas bûn û iro gihîştin wê radeyê ku proleterya bêyî ku civakê bi tevahî

ji kedxwarî, pêkutî, cudahiyên çînî û têkoşînên çinan rizgar bike nikare xwe ji nîrê çîna kedxwar û serdestan rizgar bike.

Bi dîtina min teoriya Darwîn ji bo biyolojiyê çî kiribe dê ev qediye jî ji bo dîroknasiyê heman tiştê bike. Çend salên beriya 1845'an em her du jî nêzîkî vê qediyayê dibûn. Min bixwe ji vê hêlê ve çiqas rê kudand, hûn dikarin di xebata min a bi navê "Li Îngilistanê Rewşa Çîna Karkeran" de bibînin. Lêbelê gave ku ez di bihara 1845'an de çûme Brukselê û tê de dîsa rastî Marx hatim, wî ev qediye bi têgînên ku hema bêje bi qasî yên ku min li jorê bi kar anî zelal in da pêşiya min.

Ji bo çapa Almanî (1872) me bi hev re pêşgotinek nivîsî bû. Ez ji wê pêşgotinê vê jêgirana jêrîn vediguhêzim:

"Her çiqas di nav 25 salên dawîn de şert û merc guheribin jî rêgezên giştî yên di vê Manifestoyê de hatin nivisandan îro jî bi tevahî rast û derbasdar in. Li vir û wir dibe ku hin kitekit bêne sererast kirin. Wekî Manifesto bixwe jî diyar dike, sepandina kardarî ya van rêgezan li her derê û her tim girêdayî mercên dîrokî yên heyî ye. Ji ber vê sedemê li ser bergiriyên şoreşger ên ku di beşa duyemîn de hatin pêşniyaz kirin derbekî taybet nehate dayîn. Îro ew pasaj wê ji gelek hêlan ve bi awayekî cuda bihata nivisandin. Hem li hemberî gavên dewasa yên ku pişesaziya nûjen di nav 25 salên dawî yên piştî 1848'an de pêş ve avêtin û birêxistinbûna zêdetir pêşketî û belavbûyî ya çîna karkeran, hem jî li hemberî ezmûnên kardarî yên ku pêşî di Şoreşa Reşemiyê de, paşê û jê zêdetir jî di domana Komuna Parisê de bidestxistî (li Parisê plo-retaryayê desthiltadariya siyasî bi du mehan di bin destê xwe de girt) ev program ji hêla hin kitekitan ve kevn bûye. Tiştêkî ku ji aliyê komunê ve nemaze hate selmandin ev e: "Çîna karkeran nikare pergala heyî ya dewletê hema wisa bigire destê xwe û ji bo armancên xwe bi kar bîne." ("Li Fransayê Şerê Navxweyî; Peyama Civata Giştî ya Yekîtiya Navneteweyî ya Karkeran" binihêrin. Tê de ev xal bi awayekî zêdetir berfireh tê dahûrandin.) Her wiha ew aşkera ye ku rexneya li ser lîteratûra sosyalîst jî îro têr nake.

Ji ber ku ev bi tenê nivîsên heya 1847'an dihewîne. Şîrovên li ser partiyên dijber ên cihêreng jî (Beşa IV'emîn) her çiqas bi hîmî hêj rast bin jî ji hêla kardarî ve kevn bûne; ji ber ku rewşa siyasî bi tevahî guheriye û pêşketinên siyasî piraniya partî yên siyasî yên navborî ji holê rakirin.

“Digel vê yekê Manîfesto êdî bûye belgeyeke dîrokî û ji ber vê sedemê mafê me nîn e ku em li ser wê guherandinekê çêkin.”

Berhema di destê we de [wergera Îngilîzî-tw] ji aliyê wergêrê “Kapîtal” a Marx birêz Samuel Moore ve hatiye wergerandin. Me bi hev re çav bi wergerê xist û ji bo ravekirina çewlikên dîrokî min çend têbînî pê vekirin.

*Fredrick ENGELS*

*Londra, 30'ê Rêbendanê, 1888*



# MANÎFESTOYA PARTIYA KOMUNÎST

# Manifest

der

## Kommunistischen Partei.

---

Veröffentlicht im Februar 1848.

---

Proletarier aller Länder vereinigt euch

---

London.

Gedruckt in der Office der „Bildungs-Gesellschaft für Arbeiter“

von J. E. Burghard

46, LIVERPOOL STREET, BISHOPSGATE.

Xeyaletetek li Ewropayê digere: Xeyaleta Komunîzmê. Hemû desthilatdarên Ewropaya kevn –Papa û Çar, Metternîck û Guîzat, Radîkalên Fransîz û sîxurên polîsên Alman– di navbera xwe de tifaqeke pîroz çêkirin, da ku vê spêleyê biqewitînin.

Ma partiyeke muxalîf heye ku ji aliyê dijberên xwe yê desthilatdar ve wekî komunîst nehatibe tawanbar kirin? Û partiyeke muxalîf heye ku wê mora komunîstiyê hem ji partiyên dijber ên ji xwe zêdetir pêşketî re hem jî ji neyarên xwe yê paşverû re bi berepaş ve nepekandibe?

Ji vê rastiyê du encam derdikevin holê:

1. Komunîzm ji niha ve ji aliyê hemû desthiladarên Ewropayê ve wekî hêzekê tê pejirandin.

2. Êdî wextê wê yekê ye ku divê komunîst dîtin, raman, armanc û dilxweziyên xwe li ber hemû cîhanê bi awayekî aşkere biweşînin bi manîfestoyeke partiya xwe bersiva vê çîroka spêleya Komunîzmê bidin.

Bi vê mebestê, komunîstên ji neteweyên cur bi cur li Londrayê kom bûn; da ku bi zimanên Îngilîzî, Fransîzî, Almanî, Flemenî û Dankî bê weşandin ev manîfestoya li jêrê amade kirin.



# I

## BÛRJÛVA Û PROLETER<sup>1</sup>

Dîroka hemû civakên heyî, heya îro<sup>2</sup>, dîroka têkoşîna çinan e. Mirovên azad û bende, lord û serf, hosteyê loncayê û qelfe, bi kurtasî zordest û bindest li hemberî hev di nav dijberiya domdar de bûne û geh bi awayekî veşartî, geh bi awayekî aşkera bênavber pevçûne. Ew pevçûn her carê yan bi jinûvesazkirina civakê ya bi awayekî şoreşgerî yan jî bi hilweşîna çînên têkoşer bi dawî bûye.

Di heyamên pêşîn ên dîrokê de em li her derê sazkirineke tevlihev a civakê û senifandineke cur bi cur a tebeqeyên civakî dibînin. Di Romaya kevnare de patrîsyen<sup>3</sup>, şovalye, pleb<sup>4</sup> û bende; di Serdema Navîn de mirên feodal, vassal, hosteyên loncayê, qelfe, şagirt û serf hene. Her wiha hema bêje di nava hemû çînên han de em rastî tebeqeyên talî tîn.

Civaka burjûva ya nûjen a ku ji kavlên civaka feodal derketiye,

- 1 Peyva 'Burjûvazî' di wateya çîna kapîtalîstên nûjen, ango çîna xwediyên amrazên hilberîne yên civakî û karkerên keda-mizedar de tê bikaranîn. Peyva 'proleterya' jî di vê wateyê de hatiye bikaranîn: Çîna karkerên mizedar ên ku ne xwedî amrazên hilberîne ne ku karibin jiyana xwe bidomînin, loma jî divê hêza keda xwe bifroşin. (Têbîna Engelsî)
- 2 Ango hemû dîroka nivîskî. Di sala 1847'an de civaka beriya dîrokê, ango rêxistina civakî ya beriya dîroka nivîskî hêj nedihat zanîn. Ji wê demê pê de Haxthausenî xwendaniya (mulkiyeta) hevpar a li Rûsyayê keşf kir; Maurerî peyitand ku ew yek (xwedaniya hevpar) bingeha civakî ya hemû nijadên Teutonîk ên ku di dîrokê de cih girtine ye û wekî komên gundên ji Hindistanê heya Îrlandayê li her deverê bûye awayê seretayî (primitîf) yê civakê. Gava ku Morgani xwezaya rastin a "gens" û tşkiliya wê ya bi babistîne re keşf kir, rêxistina navxweyî ya vê civaka komunist a seretayî bi şêweya xwe ya resen derkete holê. Bi pelîşîna van komalên seretayî re civak dest bi dabeşîna di navbera çînên cuda û -axirê- dijraber (antagonîstîk) de dike. Min di (pirtûka xwe) *Jêderka Malbat, Xwendaniya Taybet û Dewletê* de hewl da ku vê pêvajoya pelîşîne bişopînim. - [Têbîna Engelsî]
- 3 Patrîsyen: Di Romaya Kevnare de endamên çînên serdest. - [Têbîna Wergêr]
- 4 Pleb: Di Romaya Kevnare de endamên çînên bindest. - [t.w.]

dawiya dijraberiye çini neani; berevaji ve yekê, li dewsa yen kevn mercên nû yen zordestî û awayên nû yen tekoşinê pêk anîn.

Digel ve yekê, taybetmendiya heyama me –heyama burjûvaziye– ew e: Wê dijraberiye çini xwerû û zelal kirine. Civak, bi tevahî, her ku diçe zedetir di navbera du aliye neyar, du çinen mezin ên ku rasterast li diji hevdu ne de leva dibe: Burjûvazî û proleterya.

Ji serfên Serdema Navîn bajarokiyên ewil ên ku xwedî mafên taybet in, derketin holê. Ji nava van bajarokiyên jî hemanên pêşin ên burjûvaziye.

Veditina parzemîna Amerikayê û gerîna li derdora Kepiyê Hêviyê ji bo burjûvaziya ku bi pêş ve diçû qadên nû vekirin. Sûkên Hîndistana Rojhilat û yê Çînê, mêtîngêkirina Amerikayê, bazirganiya bi mêtîngêhan, zêdebûna amrazên (navgînen) danûstandinê û bi giştî ya kalêran ji bazirganî, deryavanî û pişesaziye re tehneke nedîtî da. Û bi vî awayî di nava civaka feodal a ku dest bi pelişinê kiribû de hêmana şoreşger zûzûka bi pêş ket.

Li bin pergala pişesaziye ya feodal hilberîna pişesaziye ji aliye loncayên girtî ve hatibû gemerdanî (monopol) kirin û ew pergal êdî têra hewcehiyên zêdebûyî yê sûkên nû nedikir. Li cihê wê pergala manûfaktûrê ket dewrê. Hosteyên loncayê ji aliye çîna navîn a manûfaktûrvanên ve avêtin quncikekî. Karbeşiya di navbera loncayên korporatîfên cihêreng ku li hemberî karbeşiya di nava her kargehekê de, nekarî li ber xwe bide, ji hole rabû.

Di ve navberê de sûkan pêşketina xwe didomand û daxwazî jî her ku diçû zedetir dibû. Manûfaktûrê jî êdî têrê nedikir. Piştî, dûkel û makîneyê di hilberîna pişesaziye de şoreşek çêkir. Li şûna manûfaktûrê Pişesaziya Nûjen û li şûna çîna navîn a pişesaziye jî milyonerên pişesaziye, ango serekên artêşên pişesaziye, bi gotineke din burjûvaziya nûjen derket holê.

Pişesaziya nûjen sûka (bazara) cihanê pêk anî. Jixwe keşîrkirina Amerikayê rîya ve yekê vekiribû. Wan sûkan bazirganî, deryavanî û xwe-gihandina bejahiyê gelek bi pêş xistin. Bi pêşketina pişesazî, bazirganî, deryavanî û riyên hesinî re burjûvaziye jî bi

qasî wê rêjeyê sermayeya xwe zêde kir û hemû çînên ku ji Serdema Navîn mabûn bi paş de xistin. Lewra em dibînin ku burjûvazî bi xwe berhema pêvajoyeke pêşketinê ya dûvedirêj e û encama wan şoreşên e ku di awayên hilberîn û danûstandinê de pêk hatine.

Burjûvazî, digel her gava ku pêş ve avêt, ji hêla siyasî ve jî pêş ve çû. Burjûvazî di bin serdestiya torîniya feodal de çîneke bindest, di nava komunên Serdema Navîn de jî –geh wekî komarên bajarî yên serbixwe (li Îtalya û Almaniyayê), geh wekî “tebeqeya seyemîn” a keyîtiyê (monarşiyê) ya ku bac jê dihat standin (li Fransayê)–komeleyeke çekdar û xweser bû. Dûre di heyama manûfaktûrê de li dijî torîniyê suxrevaniya keyîtiyên nîvfeodal an jî yên mutleq kirîbû. Bi rastî ew goşebera keyîtiyên mezin bû. Axirê wê burjûvaziyê ji sazkirina pîşesaziya nûjen û pêkanîna sûka cîhan ê pê ve di nava dewleta nûjen a nîmanî (temsîlî) de serdestiya siyasî xist destê xwe. Rêveberiya dewleta nûjen bi tenê kombesteke ku karên hevpar ên hemû burjûvaziyê dimeşîne.

Burjûvaziyê ji aliyê dîrokî ve rola herî şoreşger leyîst

Li her dera ku burjûvazî lê serdest bû, wê tîkiliyên feodal, rêzdar (patriarchal) û pastoral ji holê rakirin. Wê bendên feodal ên ji her cureyî yên ku mirov bi raserên wan ên xwezayî ve girêdidin bi stemkarî qetandin. Di navbera mirovan de ji bilî berjewendiyên ferdî yên çiptazî, ji bilî “diravdana neqd” a dilkevîr tiştêk nehişt. Xayîsiyên olî yên herî agirnak, ços û peroşa şovalyetiyê û hestyariya bêteşe di nava ava cemidî ya berjewendîperestiyê de fetisandin. Wê nirxa ferdî dagerand nirxa danûstandinê û li şûna azadiyên taybet ên neguherbar bi tenê azadiyek, azadiyê bêsînor anî: Bazirganiya Azad. Bi kurtasî wê li şûna kedxwariya ku bi xapandinên alî û siyasî dihat nixumandin û veşartin kedxwariyê çiptazî û bêşerm, kedxwariyê rasterast û hov anî.

Burjûvaziyê sîwana hemû pîşeyên ku heya îro pîroz dihatin dîtin û bi xapeke rêzdar nêzikayî lê dihate kirin jî ji serê wan kir. Wê bijîşk, parêzer, keşe, helbestvan û zanyar kirin kedkarên xwe yên mizedar.

Burjûvaziyê xêliya kartêker û hestewariyê ji rûyê malbatê vekir û têkiliya malbatî dagerand tekiliyeke diravî.

Di Serdema Navîn de pêşaniyên hovane yên serkeftinê –ku paş-verû ji wan re heyran diman– çawa tevizî û tiralî wekî temamkera xwe dît, ew yek ji aliyê burjûvaziyê ve hat aşkera kirin. Çalakiya mirovan çi dikare pêk bîne, ew yek jî cara ewilîn ji aliyê burjûvaziyê ve hat nîşandan. Nuwazeyên ku burjûvaziyê afirandine ji Pîramîdên Misirê, kemerên avê yên Romayê û katedralên Gotîk bihartî ne. Wê bi seferên xwe Koçên Qewman û Seferên Xaçdaran bi piyê xwe ve kaş kirin.

Burjûvazî, bêyî ku amrazên hilberînê –lewma têkiliyên hilberînê û bi wan re jî hemû têkiliyên civakî– ji bîni ve biguherîne, nikare hebûna xwe bidomîne. Berevajî vê yekê, ji bo çînen berê yên pîşesaziyê hêvişandina awayên hilberînê yên kevn mercê pêşîn ê hebûnê bû. Di warê hilberînê de şoreşa domdar, di şert û mercên civakî de aloziyên bênavber, nediyariya biberdewam û geremol heyama burjûvaziyê ji heyamên din vediqetînin. Hemû têkiliyên westar (sabît) û sext bi pêşdarazî û hizrên xwe yên kevnar û giramîdar re tèn gêzikkirin û avêtin, hemû têkiliyên nû çekirî ji hêjan bêyî ku cihê xwe bigrin dibin kevnar. Hêmu tiştên hişk dibin hilm û gulm û tevî hewayê dibin, hemû tiştên pîroz giramdariya xwe winda dikin; û di dawiyê de mirov bêgav dimînin ku bi rûbarî hestên giranxû, şert û mercên rastîn ên jiyana xwe û têkiliyên xwe yên wiha, bikevin.

Ji bo berhemên wê, hewcedariya burjûvaziyê ya bi sûka ku her diçe mezin dibe, heye. Wê yekê burjûvazî bi hemû aliyên cîhanê ve ajot. Divê burjûvazî xwe bigihîne her derê, li her derê bi cih bibe û li her derê têkiliyan çêke.

Burjûvaziyê bi bikaranîna sûka cîhanê li hemû welatan ji hilberîn û xeritanê re taybetmendiyêke kozmopolît da. Tevî ku paş-verû jê qehirîn, burjûvaziyê bingeha neteweyî ya pîşesaziyê ji bin piyên wê kişand. Hemû pîşesaziyên neteweyî yên kevn an hatin hilweşandin an jî her ku diçe tèn hilweşandin. Ew ji aliyê pîşesaziyên nû ve ji holê hatin rakirin. Avakirina van pîşesaziyên nû ji bo



hemû neteweyên şareza meseleya man û nemanê bû. Ew pişesazî êdî ne madeya xam a xwemalî, lê madeya xam a ku ji herêmên herî dûr tê anîn, bi kar tinin. Berhemên van pişesaziyên ne bi tenê li nav welat, li çar aliyên cihanê tî xeritandin. Di demên berê de hilberîna welatan bersiva daxwazên wan dida. Niha em dibînin ku daxwazên nû derketên holê û ji bo bersivdana van daxwazan berhemên welatên dîtir û avhewayên wan divên. Li şûna tenêtiya heremî û neteweyî û li şûna ji xwe re -besayîbûnê êdî li her derê ne bi tenê di warê hilberîna madî de, her wiha di warê hilberîna ramanî (entelektûel) de jî em tîkiliyên gerdûnî û rajêrî beramber ên neteweyan dibînin. Afirandinên ramanî yê neteweyên cuda cuda bûn xwedaniya hevpar. Yekalîti û fehmkoriya neteweyî her ku çû ne gengaz bûn. Ji wêjeyên heremî û neteweyî jî wêjeyeke cihanê derket holê. Di encama pêşketina lezgîn a hemû amrazên hilberîne û hêsanbûna ragihandinê de burjûvaziyê yê herî barbar (hov) jî di nav de, hemû netewe kişandin hundirê şarîstaniyê. Erzaniya kalêrên burjûvaziyê bû topên giran û bi ser hemû sûrên çînî de gule barandin. Bi vî awayî burjûvaziyê zor li barbaran kir, da ku ew dev jî neyariya xwe ya li dijî biyaniyan berdî. Burjûvazî hemû neteweyan bi gefa tunekirinê bêgav dihêle ku ew awayê hilberîna burjûvaziyê bipejirînin û wê tîsta ku burjûvazî jê re dibêje şarîstanî bikin nava xwe, ango ew bixwe bibin burjûva. Bi kurtasî, burjûvazî li gorî nîgaşa xwe dinyayekê diafirîne.

Burjûvaziyê çolter kirin bin serdestiya bajêr; bajarên pir mezin afirandin; li gorî gelheya çolteran gelheya bajaran gelek zêde kir û bi vî awayî beşeke girîng a çolteran ji debengiya (ehmeqiya) jiyanê çolterî xelas kir. Çawa ku wê çolter ji bajarên re rajêr kirin, di heman demê de welatên barbar û yê niv-barbar ji welatên şareza re, neteweyên gundî ji neteweyên bajarî (burjûva) re û Rojhilat jî ji Rojavayê re rajêr kirin.

Burjûvazî, belawelatiya gelheyê, belawelatiya amrazên hilberîne û belawelatiya xwedaniyê her ku diçe zêdetir ji holê radike. Burjûvaziyê gelhe sift kir; amrazên hilberîne li navendan û xwedanî jî di çendik destan de kom kirin. Encama jênerewîn a vê

yekê navendîbûna siyasî bû. Eyaletên serbixwe yan eyaletên ku bi bendên sist bi hevûdu ve giredayî ne û xwedî berjewendî, zagon, hikumet û pergälên bacê yên cuda ne, di nava neteweyeke ku xwedî hikumetek bi tenê, komeke zagonan, berjewendiyeke çîni ya neteweyî, sînorek û gumrikekê de ye, kom bûn.

Hêzên hilberîne yên ku burjûvaziyê di domahiya serdestiya xwe ya sedsalî de afirandin ji tevehîya hêzên hilberîne yên ku ji aliyê hemû nîşên berê ve hatibûn afirandin hêj xurtir û gumlatî ne. Ketina hêzên xwezayî ya bin fermana mirovan, hilberîna bi makîneyan, di warê pîşesazî û çandiniyê de bikaranîna kîmyayê, keştiyên dûkelî, riyên hesinî, telgrafa karebadar (bielektrik), vekirina hemû parzemînan ji bo çandiniyê, bi kanalên avê xistin -bin kontrolê ya çeman, girseyên mirovan ên wekî ji kuna mozegirtikan derbûyî...- Di sedsalan berê de ma bi qasî misqalê be jî pê hesiyana ku ew hêzên hilberîne di hembêza keda civakî de dihênijin?

Bi rastî jî em dibînin ku amrazên hilberîne û yên danûstandinên ku burjûvaziyê xwe li ser wan ava kiriye, di nava civaka feodal de hatin pêkanîn. Di gihîneka diyarkirî ya domana pêşketina van amrazên hilberîne û yên danûstandinê de mercên hilberîn û xertanê yên civaka feodal, sazûmana feodal a çandiniyê û ya manûfaktûrê, ango bi kurtasî tîkiliyên xwedaniyê yên feodal êdî li hêzên hilberîne yên pêşketî nedihatî û li pêşîya wan bûne asteng. Diviya ku ew bihatana wesle wesle kirin; û hatin wesle wesle kirin jî.

Reqabeta serbest ket şûna wan. Saziyêke civakî û siyasî ya guncan û serdestiya aborî û siyasî ya çîna burjûvaziyê pê re çûn.

Bizaveke manend li ber çavên me diqewîme. Civaka burjûva ya nûjen, civakeke ku amrazên wisan dêwasa yên hilberîn û danûstandinê pêk anîne ji hêla tîkiliyên xwe yên hilberîn, danûstandin û xeritanê ve dişibe pîfînokekê ku hew dikare alema giyanan ku wî bi sêhrên xwe afirandiye kontrol bike. Digel ku çend dehsal derbas bûne, dîroka pîşesazî û bazirganiyê li dijî mercên hilberîna nûjen û li dijî tîkiliyên hilberîne ku her du jî ji bo burjûvazî û serdestiya wê mercên hebûnê yên jêner in, bi tenê dîroka serhildana hêzên

hilberînê yên nûjen e. Ji bo aşkerakirina vê yekê, mirov qeyranên aborî yên bi awayekî vedorî (periyodîk) pêk tên û her ku diçe zêdetir gefan li hebûna burjûvaziyê dike bîne ziman, bes e. Bi van qeyranan ne bi tenê berhemên heyî, hêzên hilberînê ku di demên berê de hatibûn afirandin jî bi piranî û bi awayekî vedorî jî holê tên rakirin. Şobayeke civakî ku di heyamên berê de tewş bihata dîtî – şobaya hilberîba (ape – di dema van qeyranan de peyda dibe. Civak jî nişka ve xwe di nava rewşa hovîtiya demî de dibîne. Tu dibêjî qey xelayek peyda bûye, şerekî gerdûnî yê wêranaker pêşkêşkirina hemû navgînên debarê biriyê. Baş e, lê çima? Ji ber ku pir zêde şaristanî, pir zêde navgînên debarê, pir zêde pîşesazî û pir zêde bazirganî hene. Hêzên hilberînê yên ku di bin fermana civakê de ne, êdî ber bi pêşxistina mercên xwedaniya burjûva ve xwar nabin. Berevajî vê yekê jî bo van mercên ku êdî pêşiya pêşketinên wan digirin ew pir zêde bihêz bûne. Û çawa ku ew jî heqê van astengiyan derketin, pergala burjûva xera dikin û hebûna xwedaniya burjûva diavêjin talûkeyê. Mercên civaka burjûva jî bo heyîna ku ji aliyê hêzên hilberînê ve hate afirandin teng dimînin û nikarin wê heyîne bigirin. Baş e, lê burjûvazî van qeyranan çawa çareser dike? Ji aliyekî ve bi tunekirina hêzên hilberînê û ji aliyê din ve jî bi bidestxistina sûkên nû û bi zêdetir sûd wergirtina ji bazarên kevn. Ango bi çêkirina riya qeyranên zêdetir belavbûyî û wêranker û bi kêmkirina navgînên ku pêşiya qeyranan digirin.

Çekên ku burjûvaziyê li hemberî feodalîzmê bi kar anîbûn niha jî zivirîn wê.

Lêbelê burjûvaziyê ne bi tenê çekên ku dê wê bikujin çêkin, her wiha mirovên ku dê wan çekan biemilînin jî afirandin.

Burjûvazî, anga sermaye çiqas pêşketibe proleterya, anga çîna karkeran a nûjen – çîna kedkarên ku ancax bi xebatê dikarin jiyana xwe bidomînin û ancax heta ku keda wan sermayeyê zêde bike dikarin ji xwe re karekî bibînin – jî bi qasî wê rêjeyê bi pêş ket. Ew kedkarên ku divê xwe parçe bi parçe bifroşin kalêr in; û lewma jî wekî her kalêre du carî hemû derbejêr û derbejorên reqabetê, hemû pêlpêlînên sûkê dimînin.

Ji ber bikaranîna bi awayekî belavbûyî ya makîneyan û ji ber karbeşiyê karê proletaran hemû taybetmendiyên xwe yên ferdî û ji ber vê yekê jî hemû dilkêşiya xwe ya ji bo karkeran winda kirin. Karker, bû lehêqeke makîneyê û bi tenê hunerweriya herî sivik, herî yeknesak û herî hêsan a hînbûyî jê tê xwestin. Lewra maliyeta karkerekî hate daxistin hema bêje bi tenê navgînên debarê yên ku ji bo domandina jiyân û nifşê wî hewcedariya wî pê heye. Lêbelê buhaya kalerê û her wiha ya kedê jî bi qasî maliyeta xwe ye. Ji ber vê yekê jî kerihîniya karî çiqas zêde be mize jî bi qasî wê rêjeyê kêmtir dibe. Bi ser de jî bikaranîna makîneyan û karbeşî çiqas zêde bin, geh bi zêdekirina saetên xebetê geh di nav demeke diyarkirî de zêdekirina kar an jî bi lezandina makîneyan kêferatiya kar jî bi qasî wê rêjeyê tê zêde kirin.

Pîşesaziya nûjen atolyeya kargeha biçûk a ji bav û kalan ji hoste re mabû dagerand fabriqeya mezin. Girseyên kedkaran di nav fabriqeyê de kom bûn wekî leşkeran hatin birêxistin kirin. Wekî serbazên artêşa pîşesaziyê ketin bin femandariya hiyerarşiyê békêmasî ya efsêr û çawîşan. Ew ne bi tenê bendeyên çîna burjûva ne, her wiha ji aliyê manûfaktûrvanên burjûva ve jî roj bi roj, saet bi saet tîndar kirin. Ew despotî destketiyê bi awayekî çiqas aşkera wekî armanca xwe îlan bike, ewqas firûmaye, pelas û tehdekar e. Di warê keda destan de pêdiviya bi jêhatîti û hêzê çiqas kêmtir be, bi gotineke din pîşesaziya nûjen çiqas pêş ketibe keda jinan bi qasî wê rêjeyê cihê keda mêran girt. Ji bo çîna karkeran cudahiya temen û zayendê hew xwedî derbasdariya civakî ye. Ew tevda amûrên xebata ne û li gorî temen û zayenda xwe bi vî yan wî buhayî tîndar kirin.

Gava ku karker mizeya xwe digire û kedxwariya febrîqetoran diqede, îcar jî beşên din ên burjûvaziyê –xwediyê xanî, dikandar; gerewkar û hwd.– li stûyê wî siwar dibin.

Tebeqeyên jêrîn ên çîna navîn –esnafê biçûk, dikandar û bi giştî bazirganên ku dev ji karê xwe berdane, pîşekar û gundî– tev de, geh ji ber ku sermayeyên wan ên kêmtirî hilberîna bi pîvanên mezin a Pîşesaziyê Nûjen nedikir û ew li hemberî kapîtalîstan tîndar çûn, geh ji ber ku hunerweriyên wan ên naserbûyî ku aliyê rêbazên

nû yên hilberîné ve nehêja hatin hiştin, bi berebeyî derawayên (pozîsyonên) xwe winda kirin û bûn proleter. Nexwe proleter ji hêmanên ku ji hemû çînen gel hatine, pêk tê.

Proleterya di gihanekên cihêreng re derbas dibe. Têkoşîna wê ya li dijî burjûvaziyê bi zayîna wê dest pê dike. Lêdan pêşî ji aliyê kedkarên takekes ve, dûre ji aliyê karkerên fabrîqeyekê ve, paşê jî ji aliyê karkerên li herêmekê û li dijî burjûvayekê takekes a ku keda wan dixwe tê meşandin. Karker ne bi ser mercên hilberîna burjûva de, bi ser amrazên hilberîné de êrîş dikin. Amûrên hawirdekirî (îthalkirî) yên ku li hemberî keda wan dikevin reqabetê dişkinin, makîneyan parî parî dikin, agir berdin fabrîqeyan. Hewl didin ku derawaya windakirî ya karkerên Serdema Navîn bi darê zorê ji nû ve bi dest bixin.

Di vê gihanekê de kedkar hêj girseyeke hevnegirtî ya li her aliyê welat belavbûyî û ji ber ketina nav reqabetê ya bi hevûdu re, parçebûyî ye. Ger ku kedkar li cihekê yek bin da ku komekên bikeystir pêk bînin, ew yek hêj ne encama yekbûna wan a çalak e. Wateya wê ew e ku burjûvazî ji bo gihîştina armanca xwe mecbûr maye ku proleterayê bi tevahî bixe tevgerê û her wiha bi demeke din jî dikare wê bixe tevgerê. Ji ber vê yekê di vê gihanekê de proleterya ne li dijî dijminê xwe, li dijî dijminên dijminê xwe, ango li dijî bermayiyên keyîtiya mutleq, li dijî xwediyên erdê, li dijî burjûvaziya der-pîşesazî û li dijî burjûvaziya biçûk têdikoşe. Ji ber vê sedemê tevgera dîrokî bi tevahî di destê burjûvaziye de sift dibe. Her serkeftina bidestxistî serkeftinek ji bo burjûvaziyê ye.

Lêbelê bi pêşketina pîşesaziyê re proleterya ne bi tenê bi aliyê hejmarî zêde dibe, her wiha di nav girseyên mezin de kom dibe, hêza we zêde dibe û ew jî zêdetir bi hêza xwe dihese. Çawa ku makîneyan hemû cudahiyên kedê ji holê rakirin û hema bêje her li derê mize kêr kirin û daxistin heman astê, di nav refên proleterayê de jî berjewendiyên cur bi cur û mercên jiyane yên cihêreng her ku diçe zêdetir wekhev dibin. Reqabeta di navbera burjûvayan de ya ku her diçe mezin dibe û qeyranên aborî yên ku di encama vê yekê de derdikevin holê mizyên karkeran hêj zêdetir dipêlêlin.

Pêşketina bênavber û bileza nedîtî ya makîneyan jiyana karkeran hêj zêdetir bê ewle kir. Lêkdana di navbera burjûvayê takekes û karkeran de her ku diçe dirûvê lêkdaneke di navbera du çînan de digire. Ji ber vê sedemê karker li dijî burjûvaziyê dest bi pêkanîna yekîtiyan (sendîkayan) dikin, da ku asta mizeyên wan nekeve, ew tev bi hev re têdikoşin; da ku ji bo van serhildanên çendemî di pêş de amade bin, rêxistinên mayînde dadimezrînin. Li her derê peqîn li lêkdanan dikeve û ew lêkdan dadigerin raperînan.

Car caran karker bi ser dikevin, lêbelê bi tenê ji bo demekê. Fêkiya têkoşîna wan ne di encama nêzîk de, di yekîtiya wan a ku her diçe bi pêş dikeve de, tê girtin. Amrazên ragihanê yên ku ji aliyê pişesaziya nûjen ve hatin afirandin alîkariya wê yekîtiyê dikin û di navbera karkerên ji heremên cuda de têkiliyan datînin. Ji bo ku têkoşînên bêhejmar ên xwedî heman taybetmendiyên di nav têkoşîneke neteweyî ya navçînî de bînavendîkirin jî pêdivî bi vê têkiliyê hebû. Ji ber vê hindê her têkoşîna çînî têkoşîneke siyasî ye. Û tevî ku ji ber rêbejehiyên xerab ji bo yekîtiya bajarokiyên Serdama Navîn pêdivî bi sedsalan hebûn, proleterên nûjen bi saya riyên hesinî di nav çend salan digihîştin wê yekîtiyê.

Ji ber reqabeta di navbera karkeran de, birêxistinbûna prole-taran wekî çînek û lewra jî wekî partiyeke siyasî domdar serobin dibe. Lêbelê, ew her carê ji nû ve û bi awayekî hêj bi hêztir û biryardar radibe ser piyan. Bibikaranîna dubendiyên di navbera burjûvayan de zorê dide wan ku berjewendiyên taybet ên karkeran bixin binê temînata zagonî. Li Îngilîstanê zagona kar a rojane ya deh saetî bi wî awayî kete meriyetê.

Lêkdanên di navbera çînan civaka kevn de bi tevahî û bi her awayî alîkariya pêşketina proleteryayê dikin. Burjûvazî xwe di nav pevçûneke domdar de dibîne: Pêşî bi arîstokrasiyê re, paşê jî bi beşên burjûvaziyê yên ku pêşveçûna pişesaziyê li berjewendiyên wan nedihat re; û her tim bi burjûvaziyên welatên din re. Di nav van hemû pevçûnan de burjûvazî dibîne ku hewcedariya wê bi alîkariya proleteryayê heye; serî lê dide, alîkariyê jê dixwaze û bi vî

awayî wê ber bi qada siyasetê ve dikişîne. Lewra, burjûvazî bixwe hêmanên perwerdehiya siyasî û giştî ya proleterayê pêşkeşî wê dike, bi gotineke din ew bi destê xwe proleterayê çekdar dike da ku li di jî wê têbikoşe.

Her wekî me berê jî dîtibû, bi pêşveçûna pişesaziyê ve ji endamên hemû beşên çînen serdest hin kes derbasî refên proleterayê bûn; an jî bi kêmanî mercên hebûna wan ketin talûkeyê. Ew yek jî ji bo ronîbûn û pêşveçûnê, hêmanên nû pêşkêşî proleterayê dike.

Axirê, gava ku wextê diyarker ê têkoşîna çînan nêzîk dibe, pêvajoya peliştinê ya ku di nava çîna serdest de an jî bi rastî di nava hemû qadên civaka kevn de didome awayekî wisa tund û bi bandor digire ku beşeke biçûk a çîna serdest dikeve ber vê lehiyê û tev li çîna şoreşger –çîna ku paşeroj di destê wê de ye– dibe. Çawa ku di heyama berê de beşeke torîniyê derbasî burjûvaziyê bûbû, niha jî beşek burjûvaziyê derbasî proleterayê dibe; bi teyabetî jî beşeke ji îdeologên burjûva yên ku asta têgihîna xwe ya teorîk bi qasî ku bi karibin tevgerên dîrokî bi tevahî têbigihîjin bi pêş ve birine.

Ji hemû çînen ku îro li hemberî burjûvaziyê derdikevin bi rasti tenê proleterya çînek şoreşger e. Çînen din her ku diçe dipeliştin û di dawiyê de li ber pişesaziya nûjen ji holê radibin. Heçî proleterya, ew berhema wê ye taybet û sereke ye. Çîna navîn a jêrin; manûfaktûrvanên biçûk, dikandar, pişekar, gundî tev de ji bo ku wekî beşên çîna navîn hebûna xwe ji tunebûna xwe xelas bikin li dijî burjûvaziyê têdikoşin. Ji ber vê yekê ew ne şoreşger in, kevnepereşt in. Her wiha, ji ber ku hewl didin çerxa dîrokê bi paş ve biçerixînin ew paşverû ne jî. Ger ku bi rathatinî şoreşger bin, sedem ew e: Dizanin ku ew ê di demeke kin de derbasî proleterayê bibin û vê yekê li ber çavan digirin. Ango ew ne ji bo berjewendiyên xwe yên îroyîn, ji bo berjewendiyên xwe yên dahatuyê têdikoşin; cihê xwe diterikînin da ku di nav refên proleterayê de bi cih bibin.

Heçî “çîna xaternak” e, pergê civakî (pêxwas) –ew pirseya ku ji aliyê tebeqeyên jêrin ên civaka kevn ve avêtine quncikekî û tê de bi tebatî dirize dibe ku li vir û wir ji aliyê şoreşek proleter ve ber bi

tevgerê de bê kişandin. Lê digel vê yekê mercên jiyanê, vê girseyê ji bo dek û dolabên peşverûyan wekî amûreke bi pere amade dikin.

Di nav şert û mercên proleteriyayê de mercên civaka kevn hema bêje bi tevahî ji holê rabûne. Proleter bê milk e. Têkiliya wî ya bi jin û zarokên wî re bi tu awayî naşibe têkiliya malbata burjûvaziyê. Karê nûjen ê pîşesaziyê û ji sermayeyê re rajêribûna nûjen -ku ew yek hem li Îngilîstanê hem jî li Fransayê, li Amerîkayê û li Alman-yayê eynî ye- proleter ji hemû taybetmendiyên neteweyî bê par hişt. Hiqûq, sinc, ol ji bo wan pêşdaraziyên burjûva ne û li paş van pêşdaraziyên berjewendiyên burjûva kemîn vergitine.

Hemû çînen berê yên desthildar civak ji mercên xwe yên malkirinê re rajêrî kirine û bi vî awayî hewldane ku derawayên xwe yên ku pêşî bi dest xistibûn, biparêzin. Lêbelê bêyî ku awayê xwe yê malkirinê û pê re hemû awayên din ên malkirinê ji holê rakin, proleter nikarin serweriyê li hêzên hilberînê yên civakê bikin. Tu tiştekî wan a taybet nîn e ku biparêzin û bizeximînin. Erka wan ji holê rakirina hemû ewlayî û starên xwedaniya taybet e.

Hemû tevgerên dirokî yên berê tevgerên hindikahiyan bûn, an jî xizmeta berjewendiyên hindikahiyan dikirin. Lêbelê tevgera proleterya, tevgera hişdar û serbixwe ya piraniya raser e. Beyî ku tebeqeya herî jorîn a civaka fermî bi tevahî ji holê rake, proleterya, ango tebeqeya herî jêrîn a civakê nikare rabe ser piyan.

Têkoşîna proleteriyayê ya li dijî burjûvarziyê ji hêla naveroka xwe ve nebe jî hêla şeweyê xwe ve di serî de têkoşîneke neteweyî ye. Proleteriyaya her welatî bêguman bêriya her tiştî divê ewil ji heqê burjûvaziya xwe derkeve.

Gava ku me gihanekên herî giştî yên pêşketina proleteriyayê dişayesandin, me şerê navxweyî yê kêm û zêde veşartî -şerê ku di nav civaka heyî de hikmê xwe dike- şopand; heya ku ew şer dagere şoreşa vekirî û hilweşandina bi darê zorê ya burjûvaziyê bingehên serdestiya proleteriyayê pêk bîne.

Me dît ku heya îro hemû civak li ser dijraberiya çînen serdest û bindest avabûne. Lêbelê ji bo pelixandina çînekê hewce ye ku



qet nebe hebûna wê ya bendeyî bê dayîn. Di heyama serfîtiyê de serfan derawaya xwe bilind kir û endamtiya komunê bi dest xist. Bi heman awayî burjûvaziya biçûk jî di bin nîrê feodalîzma mutleq de xwe bi pêş ve xist û bû burjûva. Lêbelê kedkarên nûjen, berevajiyê wê yekê, bi pêşketina pîşesaziyê re li dewsa ku bi pêş ve here her ku diçe zêdetir xerq dibe û li jêra mercên hebûne yên çîna xwe dikeve. Ew dibe xizan. Xizanî hem ji gelheyê hem jî dewlemendiyê hêj bileztir zêde dibe. Û di vê gihanekê de bi awayekî aşkera derdikeve holê ku burjûvazî hew dikare bibe çîna rêveber a civakê û mercên xwe yên hebûnê wekî zagoneke sereke li ser civakê pêwîst bike. Ji bo birêvebirinê ne kêrhatî ye, ji ber ku di nava sînorên bendetiyê de ew nikare hebûna bendeyane ya bendeyên xwe jî bixe bin temînatê û nikare pêşî li xerqbûna wan bigire, bendeyên wê ewqas xerq dibin ku li şûna ji aliyê wan ve bî xwedîkirin divê ew wan xwedî bike. Civak hew dikare di bin serdestiya vê burjûvaziyê de bijî; bi gotineke din hebûna wê hew li civakê tê.

Ji bo hebûn û serdestiya burjûvaziyê merca sereke pêkhatin û zêdebûna sermayê ye; merca sermayeyê jî keda mizedar e. Keda mizedar bi tenê xwe dispêre reqabeta di navbera kedkaran de. Pêşveçûna pîşesaziyê ku handêrê wê yê bêhemdî burjûvazî ye, li dewsa tenêbûna (îzolasyona) kedkaran a bi reqabetê ve girêdayî, yekbûna wan a bêhemd a bi organîsazyona kar ve girêdayî tine. Lewma, pêşketina Pîşesaziya Nûjen bingeha ku burjûvazî li ser wê hilberînê didomîne û berhemên xwe mal dike, ji bin piyê burjûvaziyê dikişîne. Ji ber vê yekê burjûvazî di serî de û beriya her tiştî mirovên ku gora wê dikolin diafrîne. Hem hilweşîna wê hem jî serkeftina proleteriyê di heman radeyê de misoger e.

## PROLETER Û KOMUNÏST

Bi gelemperî helwesta komunîstan a li hemberî proletaran çawa ye? Komunîst li dijî partiyên çîna karkeran partiyeke cuda pêk naynin.

Ji bilî berjewendiyên proleterayê tu berjewendiya cuda ya komunîstan nîn e.

Tu rêgezeke wan a sekter (mezhebî) nîn e ku pê re teşe bidin tevgera proleter.

A ku komunîstan ji partiyên din ên proleterayê vediqetîne ev e: 1) Di nava têkoşînên neteweyî yên proleterên ji welatên cur bi cur de komunîst ji bilî yên neteweyî berjewendiyên hevpar ên hemû proleterayê destnîşan dikin û derdixin pêş. 2) Di gihanekên cihê-reng ên pêşketinê yên ku divê proleterya li dijî burjûvaziyê di wan re derbas bibe de komunîst her tim û li her derê berjewendiyên hemû tevgerê dinimînin.

Lewma, komunîst ji aliyekî ve di karvaniyê (pratikê) de beşa herî pêşketî û biryardar a partiyên karkeran ên hemû welatan e û van partiyên bi pêş ve dibin; ji aliyê din ve jî di warê teorîk de li hemberî girseya mezin a proletaran xwedî avantajêke wisa ye: Ew der barê bereka meşê, merc û encamên giştî yên tevgera proleter de xwedî têngîhîneke zelal in.

Armanca nêzik a komunîstan ji ya hemû partiyên din ên proleter ne cuda ye: Pêkanîna çînek proleter, hilweşandina serdestiya burjûva û bidestxistina desthilatdariya siyasî.

Darazên komunîstan ên teorîk bi tu awayî xwe naspêrin raman û rêgezên ku ji aliyê qaşo reformvanên gerdûnî ve hatine afirandin.

Ew bi tenê pêwendiyên rastîn ên ji têkoşîneke çînan û tevgerêke dîrokî ya ku li ber çavên me diqewime derketî bi têngînên giştî didin nîşandan. Ji holê rakirina têngîliyên xwedaniyê yên heyî ne taybet-mendiyeke veqetîner a komunîzmê ye.

Hemû têkiliyên xwedaniyê yên berê bênavber dûçarî guherînên dîrokî mane; ku ev guherîn jî encama guherînên di mercên dîrokî de ne.

Wek mînak, Şoreşa Fransîz xwedaniya feodal ji bo berjewendiyên burjûvaziyê ji holê rakir.

Ji holê rakirina xwedaniyê ya bi giştî ne taybetmendiya komunîzmê ya veqetîner e. Taybetmendiya komunîzmê ya veqetîner ji holê rakirina xwedaniya burjûva ye.

Lêbelê xwedaniya taybet a burjûvaziya nûjen, derbirîna dawîn û herî nekêm a pergala hilberîn û malkirinê ye; ku ew pergala jî xwe dispêre dijberiya çînî û kedxwarina piraniyê ya ji aliyê hindikahiyê ve. Di vê wateyê de mirov dikare teoriya komunîstan bi hevokê xulase bike: Ji holê rakirina xwedaniya taybet.

Dibêjin ku komunîst dixwazin mafên malkirina ferdî ya ku mirovan bi xebata xwe ya ferdî bi dest xistiye ji holê rakin; û me kamunîstan bi vê tawanbar dikin. Ew xwedanî qoşa bingeha hemû azadî, çalakî û serwebûna ferdî ye.

Xwedaniya bi zehmetî hatiye bidestxistin, bi xwe –gezenckirîye, bixwe– ji xwe re kirî ye! Hûn qala xwedaniya pîşekarên biçûk û gundiyên belengaz, ango qala şêweyekî xwedaniyê yê pêşiya xwedaniya burjûva dikin? Hewce nîn e ku ew xwedanî bê rakirin. Jixwe pêşketina pîşesaziyê ji niha ve ew bi piranî ji holê rakiriye; û hêj jî roj bi roj wê ji holê radike.

An jî hûn qala xwedaniya taybet a burjûva dikin?

Baş e lê, ma keda-mizedar tu xwedaniyê ji bo kedkaran diafirîne. Na, ne piçikek jî. Ew sermayeyê diafirîne; ango şêweyê xwedaniyê ku ji keda-mizedar dixwe û bêyî ku keda-mizedar a nû ji bo kedxwariya teze bê pêşkeşkirin nikare zêde bibe. Xwedanî di nav şêweyê xwe yê heyî de xwe dispêre dijberiya di navbera sermaye û keda-mizedar de. Fermo, werin em ji her du aliyên ve vê dijberiyê di ber çavan re derbas bikin.

Kapîtalîstbûn ne bi tenê xwedîbûna derawayeke ferdî ye, her

wiha xwedîbûna derawayeke civakî ye jî. Sermaye berhemek pey-  
rayî (kolektîf) ye û tenê ji aliyê çalakiya yekgirtî ya gelek endamên  
civakê ve, bi ser de di dahûrana dawîn de ji aliyê çalakiya yekgirtî  
ya hemû endamên civakê ve, dikeve tevgerê.

Lewra sermaye ne hêzeke ferdî ye, hêzeke civakî ye.

Ji ber vê yekê gava ku sermaye hat dagerandin xwedaniya hev-  
par, ango xwedaniya hemû endamên civakê, ew nayê wê wateyê  
ku xwedaniya ferdî hat dagerandin xwedaniya civakî. A ku hati-  
ya guherandin bi tenê rewîştî civakî ya xwedaniyê ye. Xwedanî  
rewîştî xwe ya çînî winda dike.

Werin em niha jî keda-mizedar hildin dest.

Buhayê nîvane yê keda-mizedar mizeya kêmtirîn e; ango yekû-  
na navgînên debarê yên jêneger e kedkar pê hebûna xwe ya wekî  
kedkarekî didomîne. Nexwe, yên ku kedkar bi saya keda xwe bi  
dest dixê tenê têrî domandina hebûn û nifşa wî dikin. Em qet dil  
nakin vê malkirina ferdî ya berhemên kedê ji holê rakin. Sedema  
wê domandin û ji nû ve hilberandina jiyana mirovan e. Ew li paş  
xwe tu bermayî nahêle ku pê re kedên din bixe bin hikmê xwe. Em  
dixwazin bi tenê dawî li taybetmandiya sernewq a wê malkirinê  
bînin. Ji ber ku li bin vê yekê kedkar bi tenê ji bo zêdekirina serma-  
yeyê diji; û bi tenê heta ku ji bo berjewendiyên çîna serdest pêdivî  
pê çêbe destûra jiyana wî didin.

Di nav civaka burjûva de keda zindî bi tenê navgîneke ji bo  
zêdekirina keda hêwirî ye. Heçî civaka komunîst, tê de keda hêwirî  
tenê navgîneke ji bo firehkirin, dewlemendkirin û handana habû-  
na kedkaran.

Lewma di nav civaka burjûva de pêşeroj li ser paşerojê, di nav  
civaka komunîst de jî paşeroj li ser pêşerojê serwer e. Di nav civaka  
burjûva de sermaye serbixwe ye û xwedî kesayetî ye. Ligel vê yekê  
mirovê xebatkar rajêr e û ne xwedî kesayetî ye.

Burjûvazî ji holê rakirina vê rewşê wekî ji holê rakirina kesayetî û  
azadiyê bi nav dike! Mafdar e jî. Bêguman armanca me ji holê raki-  
rina kesayetiya burjûva, serxwebûna burjûva û azadiya burjûva ye.

Alazkirina azadî di bin mercên heyî yên burjûva de bazirganiya azad, kirîn û frotina azad e.

Lêbelê ger ku kirîn û firotin ji holê rabe, kirîn û firotina azad jî ji holê radibe. Ew qala kirîn û firotina azad û hemû "gotinên wêrek" ên burjûvaziya me yên li ser azadiya bi giştî tenê di Serdema Navîn de li dijî kirîn û firotina zêfandî û tenê ji hêla bazirganên astengkirî ve watedar bûn. Lêbelê li hemberî ji holê rakirina kirîn û firotinê, ji holê rakirina mercên hilberinê yên burjûva û ji holê rakirina burjûvaziyê bixwe, ev gotinên han bi tevahî bêwate ne.

Hûn ji ber mebesta me ya ji holê rakirina xwedaniya taybet diciniqin. Baş e, lê di nav civaka we ya heyî de, ji bo ji dehî nehê gel xwedaniya taybet jixwe ji holê hatiye rakirin. Hebûna wê (xwedaniya taybet) ya ji bo hindikahiyeye biçûk bi tunebûna wê ya ji bo ji dehî nehê gel ve girêdayî ye. Nexwe hûn me bi dilkirina ji holê rakirina şeweyekî xwedaniyê tawanbar dikin; ku mercê jênergerê hebûna vê xwedaniyê tunebûna xwedaniya ji her cureyî ji bo piraniya raser a gel e.

Bi kurtasî hûn me bi dilkirina ji holê rakirina xwedaniya xwe tawanbar dikin. Belê, a ku em dil dikin bi mîsogerî ew e.

Ji kêliya ku ked hew dikare bê dagerandin sermaye, diravan rantê -ango hêzeke civakî ya gemerdanî kirî- pê ve; bi kurtasî ji kêliya xwedaniya ferdî hew dikare bê dagerandin xwedaniya burjûva (sermayeyê) pê ve ferdîtî ji holê radibe.

Ji ber vê yekê divê hûn ji xwe mikur bînin ku gava hûn dibêjin 'ferd' alaza we bi tenê burjûva ye, kesê ji çîna navîn a xwedî milkan e. Ew kes bi rastî jî divê ji holê bê rakirin û avêtin.

Komunîzm tu kesî ji hêza malkirina berhemên civakî bêpar nahêle. Ew bi tenê wî kesî ji hêza xistina bin nîrê keda mirovan, ji amûrên wiha yên malkirinê bêpar dihêle.

Li ber vê yekê radibin û dibêjin ku piştî xwedaniya taybet ji holê hat rakirin hemû xebat dê bisekinin û tîraliyeke gerdûnî dê me tev de dil bigire.

Li gorî vê vacê (mantiqê) civaka burjûva diviya ji mêj ve ji ber beredayitîyê bihelikiya. Çimkî endamên wê civakê yên ku dixebitin nikarin tu tiştî bi dest bixin; yên ku hemû tiştan bi dest dixin jî naxebitin. Ev îtiraz bi tenê bilêvkirina din a wê totolojiyê<sup>1</sup> ye: ji ber ku hew sermaye hebe, keda- mizedar jî hew dibe.

Burjûvazî ji ber windabûna çandê şîn digire. Lêbelê ew çand ji bo piraniya raser bi tenê perwerdeyeke ku wan hînî tevgerîna wekî makîneyan dike.

Heta ku hûn mebesta me ya ji holê rakirina xwedaniya burjûva li gorî pîvanên xwe û bi têgînên burjûva mîna azadî, çand, hiqûq û hwd. biwezînin, bi me re niqaş nekin. Ramanên we encamên xwezayî yên şert û mercên hilberîna we yên burjûva û xwedaniya burjûva ne. Her wiha hiqûqa we jî vîna çîna we ye, vîna pêkanîna zagonê ku ji bo her kesî girêdar e. Rewişt û bereka vê vînê jî ji aliye mercên hebûnê yên çîna we ve tîn diyar kirin.

Şaş têgîhîneke xweperest han (teşwîq) dide we da ku hûn şêweyên civakî yên ku ji awayê hilberîn û xwedaniya we yê heyî derketin – têkiliyên dîrokî yên ku di pêvajoya hilberînê de derdikevin holê û ji holê radibin – dagerînin zagonên nemir ên hiş û xwezayê. Hûn vê şaş têgîhîne bi hemû çînen serdest ên beriya we re parve dikin. A ku hûn di xwedaniya kevnare de bi aşkerayî dibînin û der barê xwedaniya feodal de dipejirînin, nikarin di xwedaniya xwe ya burjûva de bibînin û bipejirînin. Pejirandina wê ji we re qedexekirî ye.

Ji holê rakirina malbatê! Yên herî radîkal jî li hemberî vê pêşniyara bêfedî ya komunîstan diqehirin.

Baş e, lê malbata burjûva ya heyî li ser çi bingehe ava bûye? Li ser sermayeyê û qezenca taybet. Bi awayekî tam pêşketî ev malbat bi tenê di navbera burjûvayan de heye. Digel vê yekê, di navbera proletaran de tamamkera vê rewşê tunebûna rasteqînî ya malbatê û di nav civakê de jî belaviya fihûşe ye.

Gava ku tamamkera wê ji holê rabû, dê malbata burjûva jî ji holê rabe û ew her du jî bi ji holê rabûna sermayeyê re dê ji holê rabin.

Hûn me bi xwestina ji holê rakirina kedxwariya zarokan ji aliyê dê û bavan ve sûcdar û tavanbar dikin? Baş e, em vî sûcî bi dilxweşî digirin ser xwe.

Lêbelê hûn ê bibêjin ku şûna perwerdehiya malbatê pêkanîna perwerdehiya civakî têkiliyên herî pîroz ji holê radike.

Ew perwerdehiya we! Ma ew jî ne civakî ye? Ma ne ji aliyê mercên civakî ve ku hûn li bin van mercan perwerde dikin, tê diyarkirin? Civak geh bi rasterast geh bi navberiya dibistanan û hwd. têkilî bi perwerdehiyê nake? Têkilîkirina bi perwerdehiyê ne dahêna (îcada) komunîstan e. Komunîst bi tenê hew didin da ku rewîsta vê têkilîpêkirinê biguherînin û perwerdehiyê ji bandora çîna serdest rizgar bikin.

Pîşesaziya nûjen, di navbera proletaran de têkiliyên malbatî her ku diçe zêdetir dike kerker, zarokên wan dadigerîne eşyayên hêsan ên bazirganî û amrazên kar. Ji ber vê yekê teretûreyên burjûvaziyê yên li ser perwerdehî û têkiliya pîroz a di navbera dê-bav û zarokan de jî her ku diçe zêdetir keraxî dibe.

Burjûvazî dike qaje qaj, dibêje hûn komunîst dê jinan bikin malê civakê yê hevpar!

Burjûva jina xwe wekî amrazeke hilberînê dibîne. Û gava ku ew dibihîze dê amrazên hilberînê bi awayekî hevpar bêne bikaranîn, nikare encameke din jê derxe û dihesibîne ku jin jî wekî amrazên din dê bibin milkên hevpar ên her kesî.

Jin wekî amrazên hilberînê tên dîtîn. Armanca komunîstan ji holê rakirina wê derawayaya jinan e lêbelê hişê wan têra vê yekê nake.

Burjûvaziya me angaşt dike ku dê komunîst jinan bi awayekî aşkera û fermî bikin milkên hevpar û hêrsa wan pê radibe. Tiştêk tune ye ku ji vê hêrsa wan pêkenoktir be. Hewce nîn e ku komunîst xwedaniya hevpar a jinan bînin. Jixwe ew yek ji demên herî kevn pê ve heye.

Burjûvayên me qîma xwe bi jin û keçên karkerên xwe naynin

-em qala qehpikan nakin jî-; her wiha ji xirandina jinên hevdu ji gelek hez dikin.

Pergala zewaca burjûva bi rastî emilandina hevparî ya jinê ye. Ji ber wê yekê ew dikarin komunîstan bi xwestina anîna hevpariya aşkera û zagonî ya jinan li şûna fihûşa bi durûtî û veşartî herî zêde tawanbar bikin. Lê ev xirecirên burjûva li aliyekî, ew aşkera ye ku gava pergala hilberînê ya heyî ji holê hat rakirin, divê hevpariya jinan a ku ji vê pergale derketiye jî ji holê bê rakirin.

Her wiha, komunîst bi xwestina ji holê rakirina welat û neteweyan jî tên tawanbar kirin.

Welatê karkeran nîn e. Em nikarin tişteki ku ew ne xwedî bin ji destê wan bigirin. Ji ber ku proleterya beriya her tiştî divê serdestiya siyasî bi dest bixe, divê ew bixwe neteweyan pêk bîne. Di wateya burjûva ya peyvê de nebe jî heta radeyekî jixwe ew bixwe neteweyî ye.

Cudahî û dijraberiyan neteweyî yên di navbera gelan de bi saya pêşketina burjûvaziyê, azadiya bazirganiyê, pêkhatina sûka cîhanê, manendiya awayê hilberînê û ya mercên jiyane her ku diçe ji holê radibin.

Serdestiya proleterayê dê wan cudahî û dijraberiyan hêj bileztir ji holê rake. Çalakiya yêkbûyî ya qet nebe welatên şareza yekî ji mercên pêşîn ên rizgariya proleterayê.

Gava ku kedxwarina mirovekî ji aliyê mirovekî din ve bi dawî bû dê kedxwarina neteweyekê ji neteweyek din ve bi dawî bibe. Gava ku di nava neteweyê de dijraberiyan çînî ji holê rabûn, dê neyariya neteweyekê ya li dijî neteweyeke din jî ji holê rabe.

Tehnandinên li dijî komunîzmê yên ji bergeha olî, felsefî û bi giştî jî bîrdoziyê (îdeolojîk) ne hêjayî lêkolînek cidî ye.

Bi her guherîneke ku di mercên hebûnê, têkiliyan civakî û jiyana civakî ya mirovan de pêk tê raman, dîtî û têgihanên mirovan jî diguherin. Ji bo ku mirov bi vê rastiyê fêhm bike, ma pêdivî bi feraseta kûr heye?



Bi qasî ku hilberîna madî diguhere hilberîna ramanî jî ji hêla rewîsta xwe ve diguhere. Ma dîroka ramanan jî bilî vê kirûyê çi diselmîne? Ramanên serdest ên her serdemê ramanên çîna serdest a wê serdemê ne.

Gava ku der barê ramanên ku bi awayekî şoreşgerî civakê diguherînin de tê axaftin, rastiya ku nayê gotin ev e: Hemanên civaka nû di nav civaka kevn de hatin afirandin. Bi jî holê rabûna mercên kevn re ramanên kevn jî ji holê radibin.

Dema ku cîhana kevnare di sekeratê de bû filehiyê olên kevnare têk birin. Gava ku ramanên filehîtiyê di sedsala 18'emîn de stû ji ramanên rasyonalist ve xwar kir, civaka feodal bi burjûvaziya şoreşger a wê demê re di nav şerê man û nemanê de bû. Ramana azadiya olî û wijdanî ancax di warê zanyariyê de wate da serdestiya reqabeta azad.

Dê bê gotin ku:

“Ramanên olî, sincî, felsefî û hiqûqî di domana pêşketina dîrokê de bêguman hatine guherandin. Lêbelê ol, sinc, felsefe, siyasetzanî û hiqûq digel vê guherandinê her tim li ser piyan mane.”

“Her wiha rastiyên nemir ên wekî azadî, dadmendî û hwd. ku ji bo civakên ji her cureyî nixên hevpar in jî hene. Komunîzm li şûna ku li ser bingeheke nû ve ava bike; hemû rastiyên nemir -ol, sinc û hwd.- bi tevahî ji holê radike. Lewma, ew bi berevajiyê hemû ezmûnên dîrokî ve tevdigere.”

Xuleseya vê tawanbarkirinê çi ye? Dîroka hemû civakên pêşerojê xwe spartiyê pêşketina dijraberiyan çîni. Van dijraberiyan jî di heyamên cihêreng de teşeyên cihêreng girtin e.

Digel vê yekê teşeya ku wan girtiye çi dibe bila bibe ji bo hemû serdemên bihurî rastiyeke hevpar heye: xwarina keda beşeke civakê ya ji aliyê beşeke din ve. Nexwe ew xwezayî ye ku digel hemû piranî û çendetexlitiyên ku wê pêşandan hişmendiya civakî ya serdemên bihurî di nav teşeyên hevpar de an di nav çarçoveya ramanên giştî de tevdigere. Ku ew dijraberiyan çîni bi tevahî ji holê ranebin, ew teşe û raman jî ji holê ranabin.

Şoreşa Komunîst veqetina kokdar (radîkal) a ji têkiliyên kevneşopî yê xwedaniyê ye. Xwezayî ye ku ji bo pêşketina wê pêdivî bi veqetîna radîkal a ji ramanên kevneşopî heye.

Ka werin êdî em dev ji îtirazên burjûvaziyê yê li dijî komunîzmê berdî.

Me li jorê dît ku di şoreşê de gavê yekemîn ev e. Divê proleterya xwe bilind bike derawaya çîna serdest û di têkoşîna demokrasîyê de bi ser bikeve.

Proleterya dê serdestiya xwe ya siyasî bi kar bîne da ku hemû sermayeyê gav bi gav ji destê burjûvaziyê derxe, hemû amrazên hilberînê di destê dewletê de ango di destê xwe yê wekî çîna serdest birêxistin bûyî de navendî bike û hêzên hilberînê bi qasî ku ji destê wê bê bi lezî zêde bike.

Bêguman di destpêkê de bêtî êrîşên tund ên li ser mafên xwedaniyê û mercên hilberîna burjûva, ew yek ne pêkan e. Lewra jî bi bergiriyên ku ji hêla aborî ve kê û nehişwer dixuyin lê bi pêvajoya tevgerê ve dê ji xwe bibihêrin, divê li ser pergala kevn a civakê êrîşên nû bêne kirin. Ji bo ku awayê hilberînê ji binî ve bê guherandin ew êrîş wekî navgînekê jêveneger in.

Ev bergirî, bêguman, li gorî welatan diguherin.

Digel vê yekê di welatên herî pêşketî de bergiriyên guncan ev in:

1. Divê xwedaniya axê ji holê bê rakirin û hemû rantên axê ji bo armancên gelemperî bî bikaranîn.

2. Baceke dahatê ya giran û pilekirî. Dahat çiqas bilind be divê rêjeya bacê jî bi qasî wê radeyê bê bilind kirin.

3. Divê hemû mafên mîratê ji holê bêne rakirin.

4. Divê hemû mal û milkên revok, penaber û serhildêran bêne desteserkirin.

5. Bi riya bankayeke neteweyî ya ku xwedî sermayeya dewletê û gemerdaniya taybet e, divê hemû qredî di destê dewletê de bêne navendî kirin.

6. Divê amrazên ragihandinê û yê veguhastinê di destê dewletê de bêne navendî kirin.

7. Divê fabriqê û amrazên hilberînê yên aidî dewletê bêne belave û zêde kirin; erdên vala ji çandiniyê re bêne vekirin û bi giştî jî berdariya axê li gorî planeke hevpar bê zêde kirin.

8. Ji her kesî re binbarîtiya wekhev a xebita. Divê artêşên pişesaziyê bêne saz kirin, nemaze ji bo çandiniyê.

9. Divê çandinî bi pişesaziyên çêker ve bîr girêdan. Divê cudahiya di navbera bajar û gundan de li seranserê welat bi belaviya zêdetir wekhev a gelheyê re bi bereberetî jî holê bê rakirin.

10. Di dibistanên gelemperî de ji hemû zarokan re perwerdahiya bêdirav. Divê xebitandina zarokan a di fabriqeyan de ya bi awayê heyî bê bi dawî kirin. Divê perwerdehî bi pişesaziyê ve bê girêdan, û hwd., û hwd.

Gava ku cudahiyên çînî di nav pêvajoya pêşketinê de ji holê rabûn û hilberîn bi tevahî di destê rêxistina fireh a hemû neteweyê de hat navendî kirin, desthilatiya gelemperî dê rêwiştî xwe ya siyasî wînda bike. Desthilatiya siyasî ku ev bi nav kirin di cih de ye, li dijî çînekê hêza birêxistinîkirî ya çîneke din e. Heke proleterya di domana têkoşîna xwe ya li dijî burjûvaziyê de ji ber zorandina mercan neçar maye ku xwe wekî çînek birêxistin bike, bi rîya şoreşekê bûye çîna serdest û mercên kevn ên hilberînê bi darê zorê jî holê rakirine, hingê dê ew bi wan mercan re mercên hebûne yên dijraberiyan çînî û bi giştî ya çînan jî holê rake û bi vî awayî dawî li serdestiya xwe ya wekî çînekê jî bîne.

Li şûna civaka burjûva ya kevn û çîn û dijraberiyan çînî yên wê civakê em ê xwedî yekîtiyekê bin ku tê de pêşketina azad a her ferdekî, merca pêşketina azad a her kesî wê hebe.

# LÎTERATÛRA SOSYALÎST Û KOMUNÎST

## 1. Sosyalizma Paşverû

### a) Sosyalizma Feodal

Bi saya derawaye wan a dîrokî nivîsandina namîlkeyên li dijî civaka burjûva ya nûjen bû karê arîstokrasiya Îngilîz û Fransîz. Di Şoreşa Tîrmehê ya Fransîzan û tevgera reformê ya Îngilîzan de ev her du arîstokrasî jî li hemberî 'dî û nedîtî' (paşredîtî) yê kerixî dîsa têk çûn. Ji wê demê pê de pevçûnên siyasî bi tevahî ji rojeve derketin. Bi tenê têkoşîneke toreyî ma. Lê di warê literatûrê de jî xirecîrên kevn ên heyama Restorasyonê<sup>1</sup> hew pêkan bûn.

Da ku xwe xwîngerm bi de xuyakirin, arîstokrasîyê bi neçarî û qet nebe li ber çavan berjewendiyên xwe di paş guhê xwe re avêt û şemîsandinên xwe yê li dijî burjûvazîyê li ser navê çîna karkeran rave (formule) kir. Bi rastî jî arîstokrasîyê li ser serdestsên xwe yê nû hîcw strandin; ji guhên wan re der barê bobelata ku nêzik dibe de mirwayên (kehanetên) bêyom pispisandin û pê re heyfa xwe rakirin.

Sosyalizma feodal bi vî awayî derket holê: Nîv-gazind, nîv-hicw; nîv-dengvedana demên bihurî, nîv gef û gura paşerojê; car caran bi rexneyên tûj, nuktedar û aşkera êrîşkirina li ser dilê burjûvazîyê... Lêbelê ji ber bêferavetîya ji bo fehmkirina meşa dîroka nûjen ev derbeyên sosyalizma feodal ji aliyê hêza bandorkirinê ve her tim pêkenok man.

Arîstokrasî ji bo ku girseyên gel li dora xwe kom bike di eniya şer de tûrikê parsê yê proletaran wekî alekê peland. Lêbelê mirovên ku tevî wan bûn bi qûna wan ve armayên (nîşanên) feodal didîtin û pîrî caran bi tîqetîqên tinazker ji wan vedîqetîyan.

1 A ku mijara gotinê ye ne Restorasyona Îngilîzan (1660-1689), Restorasyona Fransîzan (1814-1850) e.- (Têbîna Engelsî)

Beşeke ji Aligirên Zagonê (Legitimîst) yên Fransiz û komela 'İngilistana Civan' ev qeşmerî li ser dika şanoyê pir rind nişan dan.

Gava feodalist destnişan dikin ku rêbaza wan a kedxwariya ji ya burjûvaziyê cuda ye, wê yekê ji bîr dikin: Wan di şert û mercên cip-cuda de kedxwarî dikir û wexta wê yekê derbas bû. Her wiha gava ew destnişan dikin ku di bin desthilatiya wan de proleteraya nûjen tune bû, wê yekê ji bîr dikin; Burjûvaziya nûjen berhema jênerewîn a civaka wan e.

Ew nikarin rewîştî paşverû ya rexneyên xwe veşêrin. Li dijî burjûvaziyê tawanbarkirina wan a sereke ew e: Di bin pergala burjûva de çinek bi pêş dikeve; çineke ku erka hilweşandina ji binî ya pergala kevn li eniya wê hatiye nivîsandin.

Ne ji ber ku burjûvazî proleterayê diafirîne, lê ji ber ku burjûvazî proleterayêke şoreşger diafirîne ew jê diqehirin.

Ji ber vê yekê di kardariya siyasî de li dijî proleterayê tevli hemû bergiriyên zordest dibin. Di jiyana rojane de ji digel hemû gotinên xwe yên bitûmtûrak sêvên zer ên ku ji dora pişesaziyê ketin erdê kom dikin. Rastî, evîn û rûmetê difroşin û wekî bergiya wan hirî, şekirê silqê û vexurka dawerivî ya ji kartolan bidestxistî dikirin.<sup>1</sup>

Çawa ku keşe her tim bi mîran re mil bi mil digerin, sosyalizma Ruhbanî jî bi sosyalizma feodal re mil di mil digere.

Ji zahidiya filehiyê re dayîna rengêkî sosyalîst -tiştêkî jê hêsantir nîn e. Ma filehî nabêje ku ew li dijî xwedaniya teybet, zewac û dewletê ye? Li dewsa wan sedeqe û xizanî, nezewicîn û karkirina nefîsê, jiyana keşîşxaneyî û Diya Dêr şorind nade? Sosyalizma filehî bi tenê ava pîroz e, ku keşe pê re berşoşkê aristokratên dievrîn.

---

1 Ew yek zêdetir ji bo Almaniyayê derbasdar e. Li wê derê aristokrasiya xwedî erd û mîr, beşên girîng ên zeviyên xwe bi kehyeyan didin çandin û bi ser de jî ew aristokrat û mîr di heman demê de hilberînerên şekirê silqê û dawerivîner in. Aristokratên Britanyayê ku ji yên Almaniyayê dewlemendtir in, hêj jê dûr in. Lê ew jî baş dizanin ka çawa xelef li rantên daketî vegeşandin. Ji bo vê yekê navên xwe ji sazgerên şirketên anonîm ên kêr û zêde şikdar re didin kirê. (Têbîna Engels)

## **b) Sosyalizma Burjûvaziya Biçûk**

Arîstokrasiya feodal ne tenê çîneke ku ji aliyê burjûvaziyê ve hate hilweşandin; ne tenê çîneke ku mercên hebûna wê di nav atmosfera burjûvaziya nûjen de bû hilm û gulm û winda bû. Bajarkariyên Serdema Navîn û burjûvaziya biçûk a malbendî şanên burjûvaziya nûjen bûn. Di welatên ji hêla pişesazî û bazirganiyê ve hindik pêşketî de ev her du çîn li cem burjûvaziya nûjen a ku pêş ve diçe jiyana xwe ya nebatî didomînin.

Li welatên ku şaristaniya nûjen bi temamî tê de pêşketiye, çîneke nû ya burjûvaziya biçûk derket holê. Ew çîn di navbera burjûvazî û proleteriyayê de diçe û tê û wekî parçeyek temamker a civaka burjûva her ku diçe xwe nû dike.

Endamên vê çîne ji ber reqabetê her ku diçe yek bi yek diteriqin û tev li proleteriyayê dibin. Bi pêşketina pişesaziyê ve dibînin ku di demeke nêzik de dê ew wekî beşeke serbixwe ya civaka nûjen bi tevahî ji holê rabin û di manûfaktûr, çandinî û pişesaziyê de dê pişkîner, kehve û bazarvan bikevin şûna wan.

Li welatên mîna Fransa ku gelheya wê ji nivê zêdetir ji gundiyan pêk tê, nivîskarên ku li dijî burjûvaziyê di refên proleteriyayê de cih digirin bi sirûştî di rexneyên xwe yê li dijî pergala burjûvaziyê de serî li pîvanên gundîtî û burjûvaziya biçûk didan û ji bergeha van çînen navîn piştgiriya proleteriyayê dikirin. Sosyalizma burjûvaziya biçûk ji vir derket. Sîsmondî ne bi tenê li Fransayê li Îngilîstanê jî serekê vê ekolê ye.

Vê ekolê nakokiyên di mercên hilberîna nûjen de bi hendezatiyêke mezin koland. Hincetên du rû yê aborînasan derxistin pêş çavan. Bandorên wêranker ên makîne û karbeşiya kar (ya civakî), di çend destan de navendîbûna sermayeyê û erdê, hilberîna (ape û qeyran bi awaya bi awayekî ku tu kes nikare wan înkâr bike, selmandin. Hilweşîna jênerêvîn a burjûvaziya biçûk û ya gundiyan, xizaniya proleteriyayê, aloziya di hilberînê de, di dabeşkirina dewlemendiyê de newekheviyên mezin, di navbera neteweyan de şerê pişesaziyê yê man û nemanê, windabûna nîrxên sincî, qetandina tîkiliyên kevn ên malbatî û belavbûna netewayiyên kevn nîşan dan.

Digel vê yekê ji hêla armancên xwe yên erênî (pozîtîf) ve ev cureyê sosyalîzmê dixwaze an amrazên kevn ên hilberînê û yên danûstandinê û pê re jî têkiliyên kevn ên xwedaniyê û civaka kevn biselihîne (restore bike); an jî di nav çarçoveya têkiliyên kevn ên hilberînê û danûstandinê de pêşî li pêşketina amrazên nûjen ên hilberîn û danûstandinê – yên ku dê bi misagerî têkiliyên kevn ji holê rakin– bigire. Di her du rewşan de jî ew hem paşverû hem jî utopîk e.

Gotinên dawîn ên vê êkolê ev e: Ji bo manûfaktûrê loncayên korporatîf, di çandiniyê de têkiliyên bavkanî (pedersahî).

Axirê, gava ku rastiyan dîrokî yên rikdar hemû bandorên jehriya xwe-xapandinê tune kirin, ev cureyê sosyalîzmê di nav bêhêviyek xedar de bi dawî bû.

### **c) Sosyalîzma Alman an jî Sosyalîzma ‘Rastîn’**

Lîteratûra sosyalîst û komunîst a Fransayê ku di bin pêkutiya burjûvaziya desthilatdar de derket holê û derbirîna têkoşîna li dijî wê desthilatdariyê ye, dema ku ew lîteratûr ket Almanyayê burjûvaziya vî welatî hêj nû dest bi têkoşîna li dijî feodalîzma mutleq kiribû.

Filozofên Alman ku qaşo-filozof û aqilmendên terabe ne, bi çar lepan bi vê lîteratûrê ve girtin; lêbelê ew yek ji bîr kirin: Gava ku lîteratûra Fransiz koçî Almanyayê kir, ji ber mercên civakî yên Almanyayê vê lîteratûra Fransiz hemû wateya xwe ya kardarî winda kir û bergeheke bi tevahî wêjeyî (nivîskî) girt. Ji ber vê yekê ji bo filozofên Alman ên sedsala hejdehemîn daxwazên Şoreşa Fransiz bi tenê daxwazên ‘Hişê Kardarî’ bûn. Vîna Şoreşger a burjûvaziya Fransiz jî li ber çavên wan zagonên Vîna Xwerû û lewma jî zagonên Vîna mirovên rastîn bûn.

Xebatên rewşenbîrên Alman bi tenê ji wê yekê pêk dihatin: Wan ramanên nû yên felsefî yên Fransizan bi hişmendiya xwe ya kevn a felsefeyî re bînder dikirin; an jî bêyî ku dev ji bergeha xwe berdin ramanên Fransizan ji xwe re dikirin mal.

Zimanekî biyanî çawa dikin mal, ev raman jî bi heman awayî kirin mal. Bi riya wergerê.

Baş tê zanîn ka keşîşan li ser destnivîsarên berhemên klasik ên dema pûtparêziyê jînenîgariyên tewşûmewş yên Ezîzên Katolik çawa nivîsandibûn. Rewşenbîrên Alman bi literatûra der-olî ya Fransîzan re ev pêvajoyê berevajî kirin. Tewşên xwe yên felsefeyî li bin orijînalên wan ên Fransîz nivîsandin. Wekî mînak li bin rexnekirina erkên aborî yên diravî ya Fransîzan “Biyانبûna Mirovahiyê”, li bin rexnekirina dewleta burjûva jî “Hilweşandina Kategorîya Gelemerî” nivîsandin, û hwd.

Wan ew gotinên felsefî yên bitûmtûrak di bin rexneyên dîrokî yên Fransîzan de lehiqandin û bi vî awayî ew bi navên mîna ‘Sosyalîzma Rastîn’, ‘Zanîsta Sosyalîzmê ya Alman’, ‘Bingeha Felsefeyî ya Sosyalîzmê’ û hwd. mêrûn kirin.

Bi vî awayî literatûra sosyalîst û komunist a Fransîzan bi tevahî hat xesandin. Û jî ber ku vê literatûra di destê Almanan de dev ji derbirîna têkoşîna çînekê ya li dijî çîneke din berda, Alman pê hesiyana ku ew jî heqê ‘Yekalîtiya Fransîzan’ derketin û ne pêdiviyên rast lê pêdiviyên Rastiyê, ne berjewendiyên proleteriyê lê berjewendiyên Xwezaya Mirov –bi giştî berjewendiyê mirovê ku ne aîdî çînekê ye, ne xwedî rastiyekê ye û bi tenê di cîhana bi mij a venîqaşîya felsefeyî de dijî- dinimîn.

Ev sosyalîzma Alman ku wekî xwendekarekî dibistana seretayî girîngiyeke mezin dide sparteka xwe û hebanoka xwe ya jar digihîne tebeqa heftan, di vê navberê de her ku diçe bêguhiya xwe ya lewçetiyê wînda dike.

Têkoşîna burjûvaziya Alman û bi taybetî jî têkoşîna burjûvaziya Prûsan a li dijî arîstokrasiya feodal û keyîtiya mutleq, angoyê bi gotîneke din, tevgera liberal jê cidîtir bû.

Keysa ku ev demeke dirêj e “Sosyalîzma Rastîn” li benda wê bû jê re hat pêşkêş kirin. Angoyê wê keysa xwe dît ku tevgera siyasî bi daxwazên sosyalîst bide nasîn, nefretên kevneşopî yên li dijî liberalîzmê; li dijî hikumeta nîmanî; li dijî reqabet, azadiya çape-



meniyê, qanûndanîn, azadî û wekhevîyên burjûva bi dengêkî bilind bîne zimên û ji girseyan re bibêje ku bi vê tevgera burjûvaziyê re ew nikarin tiştêkî bi dest bixin û dê her tiştî winda bikin. Lê ya ku Sosyalîzma Alman tam jî di dema ku pêdivî pê çêbû de ji bîr kiriye ew e: Rexneya Fransîzan ku Sosyalîzma Alman olana ehmeqî ya wê ye, hebûna civaka burjûvaziya nûjen û pê re jî mercên aborî yên hebûna wê civakê, sazûna siyasî ya ku li gorî van mercan hat pêk anîn ji pêş ve fireh dikin. Lêbelê li Almanyayê armanca têkoşîna wê demê hêj gihîştina van tiştan bû.

Sosyalîzma Alman wekî batirsokêkê li dijî burjûvaziya gefxur xizmet li hikumetên mutleq û li rahîb, profesor, parêzvan û فرمانberên wan kir.

Li pey gule û qamçiyên tûj ên van hikumetan Sosyalîzma Alman bû dermanekî şêrîn û ew temam kir. Di heman demê de van hikumetan serhildana çîna karkerên Alman pê re tebitandin.

Gava ku wê Sosyalîzma “Rastîn” li dijî burjûvaziyê wekî çekekê xizmet li hikumetan dikir, di heman demê de berjewendiyêke paşverû –berjewendîya bawerhişkên Alman– dinimand. Li Almanyayê çîna burjûvaziya biçûk a ku bermayiyêke sedsala 16’emîn e û jê pê de bi aweyekî cur bi cur lê her tîm serê xwe xuya dike, bingeha civakî ya rast a mercên heyî ye.

Li Almanyayê parastina vê çînê parastina mercên heyî ye.

Serdestiya pişesaziyî û siyasî ya burjûvaziyê ji aliyekî ve wekî encama navendîkirina sermayeyê, ji aliyekî din ve jî wekî encama pêşketina proleteriyaya şoreşger, bo tunekirinê gef lê dixwar. Sosyalîzma Alman ji vê burjûvaziya biçûk re wisa xuya kir ku ew ê bikare pê van her du çivîkan jî bikûje û mîna şaboyekê belav bû.

Sosyalîzma Alman cibeyekî ji tevnepirikên spekûlatîf raçandî bi kulîlkên xweşgotinê ve xemilandî û bi aviya hestên nexweşok nermkirî li “rastiyên xwe yên nemir” ên mîna ta û derzî kir. Vî cibeyê derxwezayî (transcendental) di nav vê civakê de firotina kutsalên wan zêde kir.

Sosyalîzma Alman bixwe jî pê hesiya ku ew nûnerê vê burjûvaziya biçûk a bawerhişk e û her ku diçe wê rewşê dipejirîne.

Wê neteweya Alman wekî mirovê gelale (model) û burjûvayê biçûk ê bawerhişk ji wekî mirovê mînak nîşan da. Ji ber taybetmendiya serpêl a wê gelalêyê re berevajiyê rewîşt a wê ya rast wateyeke veşartî, bilind û sosyalîst da. Axirê, rasterast li ber dilxweziya “wêrankirina bi tundi” ya komunîzmê rabû û angaşt kir ku ew di ser hemû têkoşînên çînî re û bêalî ye. Ji bilî çend awerteyan hemû weşanên qaşo sosyalîst û komunîst ên ku niha (1847) li Almanyayê digerin, xwemalên vê lîteratûra kirêt û jar in.

## **2. Sosyalîzma Kevneperest an ji Sosyalîzma Burjûva**

Beşek ji burjûvaziyê bo ku hebûna civaka burjûva domdar bike û bixe li bin temînatê, dil dike ku êşên civakî biselîhîne.

Di nav vê beşê de aborînas, xêrxwaz, mirovhez (humanîst), yên ku dixwazin mercên jîyanê yên çîna karkeran qenc bikin, rêxistinîyên çalakîyên piştevanîyê, endamên komeleyên ajalparêz, alîgirên nermayîyê, ango reformvanên pinî yên ji her cureyî hene. Bi serde jî ev cureyê sosyalîzmê hate dagerandin û wekî sistemêk sehî hate bi pêş xistin.

Wekî mînaka vî cureyî, em dikarin “Philosophie de la Misere” [Felsefeya Xizaniyê] ya Proudhon nîşan bidin.

Burjûvaziyên sosyalîst dixwazin hemû avantajên mercên civakî yên nûjen bi kar binin, lê bêtir ku bi têkoşîn û talûkeyên ku encamên jênerewîn ên van mercan in rû bi rû bimînin. Ew, rewşa heyî ya civakê bêtir hêmanên wê yên şoreşger û bişivînar dixwazin. Ew li hêviya burjûvaziyê bêtir proleteriyê ne. Xwezayî ye ku ji bo burjûvaziyê cîhana herî baş ew cîhan e ku tê de ew bi xwe serdest e. Û sosyalîzma burjûva jî vê tegîhîne pêş ve dibe û bi kêr û zêde dadigerîne pergaleke sehî.

Gava ku ew ji proleteriyê dixwaze ku sistemeke wiha bisepîne û bi vî awayî rasterast ber bi Kudûsa Nû [bihuşt-t.w.] ya civakî ve bimeşe, di rastiyê de dixwaze ku proleterya di nav sînorên civaka heyî de bimîne û dev ji hemû ramanên xwe yên nebaş ên der barê burjûvaziyê de berde.

Cureyekî duyemîn ê vê sosyalîzmê jî ku ji yê yekemîn zêdetir kardarî lê kêmtir sistematîk e, hewl dide ku hemû tevgerên sosyalîst ji pêş çavê çîna karkeran bixe û ji bo vê yekê dixwaze nişanî wan bike ku ne reformeke siyasî, bi tenê veguhêranêke di mercên hebûnê yên madî û tîkîliyên aborî de bi kêrî wan tê, lêbelê ev sosyalîzm veguhêranên di mercên hebûnê de qet wekî ji holê rakirina tîkîliyên hilberînê –ku ew yek tenê bi riya şoreşekê tê pêkanîn– fehm nake. A ku ew jê fehm dike ew e: Li ser bingeha hebûna domdar a van tîkîliyan reformên rêvebirinê (îdarî); ango reformên ku bi tu awayî bandorê li ser tîkîliyên di navbera sermaye û kedê de nake, lê bi egeriya herî baş malîyeta hikûmeta burjûva kêmtir û karên rêvebirinê jî hêsantir dike.

Sosyalîzma Burjûva bi tenê gava ku dibe figûrekî axaftinê derbirîna xwe ya guncan bi dest dixê.

Bazirganiya azad: ji bo berjewendiyên çîna karkeran. Gumrika parêzger: Ji bo berjewendiyên çîna karkeran. Reforma Girtîgehan: Ji bo berjewendiyên çîna karkeran. Gotina davîn a sosyalîzma burjûva ev in. Ji xwe gotina wê ya watedar jî bi tenê ev e.

Mîrov dikare vê yekê bi hevokê xulase bike: Burjûva burjûva ye –ji bo berjewendiyên çîna karkeran.

### **3. Sosyalîzm û Komunîzma Rexneyî–Utopîk**

Li vir em qala wê lîteratûra ku di her şoreşa nûjen û mezin de her tim daxwazên proleteriyayê anîn zimên –wekî mînak nivîsên Babeuf û hwd.– nakin.

Ji bo gihîştina armancên xwe lêxebitinên ewilîn ên proleteriyayê di demên coş û peroşa gerdûnî de bi hilweşîna civaka feodal re pêk hatin. Lêbelê hem ji ber rewşa pêşneketî ya proleteriyayê û hem jî ji ber tunebûna mercên aborî ji bo rizgariya wê ev lêxebitîn çar ne çar tîk çûn. Mercên pêwîst hêj pêk nehatibûn û bi tenê ji aliyê heyama burjûva ya ku nêzîk dibû ve dê bihatana pêk anîn. Lîteratûra şoreşger a ku hevaltî bi van tevgerên ewilîn ên proleteriyayê kir bivê nevê

xwedî rewîşteke paşverû bû. Wê literatûrê zahidiyeke gerdûnî û wekheviyeke civakî ya herî çort niçiland seran.

Sistemên sosyalîst û komunîst ên St. Sîmon, Fourîer, Owen û yên din, wekî ku li jorê hatibûn nişandin, di peşwextekî de gava ku têkoşîna di navbera proleterya û burjûvaziyê de hej pêşketibû derketin holê. (Li bêşa yekemîn–Burjûva û Proleter– binihêrin).

Sazgerên van sîsteman bi rastî di awayê berê yê civakê de hem dijraberiya çînî hem jî çalakiya hêmanên dêranker dîtî. Lêbelê proleterya ku hêj di dewra naşîtiyê de bû, dîmena çîneke ku xwedî ne tu pêşdestiyeke dirokî ne jî tu tevgerêke siyasî ya serbixwe ye, pêşkeşî wan dikir.

Ji ber ku pêşketina dijraberiya çînî bi pêşketina pişesaziyê re mil di mil de pêş ve diçe rewşa aborî ya ku wan dîtibû, mercên madî yên rizgariya proleterya hêj pêşkeşî wan nedikirin. Ji ber vê yekê li pey civaknasiya nû li pey zagonên civakî yên nû yên ku dê ji aliyê wan mercan ve bêne afirandin digerin.

[Li gorî raman û dilê wan] divê çalakiya dirokî, li çalakiya wan a dahênandî stûyê xwe xwer bike, mercên civakî yên di pêvajoya dirokî de pêk hatine serî ji mercên nîqaşî re bitewînin û li şûna rêxistina çînî ya jixweber rêxistineke civakî ya ji aliyê wan dahêneran ve afirandî bikeve. Bi dîtina wan, diroka paşerojê xwe dagerîne propaganda û meşandina kardarî ya planên wan ên civakî.

Gava ku ew planên xwe amade dikin berjewendiyên proleterya –wekî çîneke ku êşên herî xedar dikişîne– li ber çavan digirin. Li ber çavê wan proleterya bi tenê ew çîneke ku êşên herî xedar dikişîne.

Ji ber rewşa pêşneketî ya têkoşîna çinan û her wiha ji ber rewşa pêşneketî ya derdorên xwe, ew xwe li ser hemû dijraberiya çînî dibînin. Dixwazin mercên her endamê civakê, heta yên herî biîmtiyaz jî, qenc bikin. Lewma wan ew yek ji xwe re kiriye kurm: Bêyî ku kesî ji kesekî din cihê bikin deng li hemû civakê dikin; û bi ser de jî dengkirina li çîna serdest çêtir dibînin. Çimkî, li gorî wan piştî ku sîstema wan carekê hat têgihîştin dê her kes bi misogerî bibîne ku ji bo civaka herî baş plana herî baş ya wan e.

Ji ber vê sedemê hemû çalakiyên siyasî, bi taybetî jî yên şoreşger red dikin. Dixwazin bi riyên aştiyane bigihînin armancên xwe. Bi ceribandîna biçûk ên ku çarneçar beredayî diçin û bi hêza mînakdayînê rê li Pirtûka Pîroz a nû vedikin.

Weneyên wiha yên der barê civaka paşerojê de di dema ku proleterya hêj pêşneketî û jar bû de hatin nîgartin. Wê demê proleterya li ser derawayaya xwe xwedî têgihîna nîqaşî bû. Ew têgihîna ji bo, ji nû ve sazîkirina giştî ya civakê bi keserên dozîna yên wê çînê re hevkeş e.

Digel vê yekê, ew weşanên sosyalîst û komunist hêmaneke rexneyî jî dihewînin. Li ser her rêgeza civaka heyî êrîş dikin. Lewma, ji bo ronîbûna çîna karkeran ew bi kerese yên herî hêja tije ne. Bergiriyên kardarî yên ku di nav van weşanan de hatin pêşniyaz kirin wekî ji holê rakirina cudahiyan di navbera bajar û gundan de, ji holê rakirina malbatê, dawîkirina bikaranîna pişesaziyê ya ji bo berjewendiyên ferdî, ji holê rakirina pergala mizyê, bangewaziya harmoniya civakî û dagerandina erkên dewletê tenê li venihartina hilberînê -hemû pêşniyazên ji vî cureyî tenê nîşanî ji holê rabûna dijraberiyan çînî dikin; ku wê gavê ew dijraberî hêj nû lê peyde dibûn û di nav van weşanan de tenê bi dirûvên xwe yên ewilîn, nîv-diyar û nepeyitandî tînin pejirandin. Ji ber vê yekê xisleta van pêşniyazan bi tevahî utopîk e.

Girîngiya sosyalîzm û komunîzma rexneyî -utopîk bi pêşketina dîrokî re xwedî tîkiliyeke berevajî ye. Têkoşîna çînan a nûjen çiqas pêş ve bikeve û teşeyê diyar bigire, ev êrîşên nîqaşî bi qasî wê rêjeyê ji wê berberiyê dûr dikevin û hemû hêjayiya xwe ya kardarî û hemû derbasdariya xwe ya teorîk wînda dikin. Lewma, her çiqas afirînên van sisteman ji gelek hêlan ve şoreşger bin jî şargirtên wan her tim bi tenê mezhebên paşverû pêk anîne.

Ramanên resen ên hosteyên wan li hemberî pêşketina dîrokî û domdar a proleteriyayê dest û milên wan zahfhişk girê didin. Ji ber vê yekê, ew her tim dikêfirin tîkoşîna çînan bikemijînin û dijraberiyan çînî li hev binin. Hêj disêwirînin ku utopyayên xwe yên civakî

bi awayekî ezmûnî pêk binin, “phalanstère”<sup>1</sup> yên îzolekirî damezrînin, “Komeleyên Xwemalî” saz bikin û “Îkaryayeke Biçûk”<sup>2</sup> ava bikin. Ji bo çêkirina van şatoyan jî çarçevar serî li hest û cizdanên burjûvayan didin. Her ku diçe dikevin nav ketagoriya sosyalîstên paşverû û kevneperest ên ku li jorê hatin şayesandin. Bi tenê bi lewçetîya xwe ya zêdetir sistematîk û bi vajbawerîya xwe ya bi bandorên bêhîtdar ên civakanasiya xwe ji wan vediqetin.

Ji ber sedemên han, ew li ber hemû çalakiyên siyasî yên çîna karkeran bi tundî radibin. Bi dîtina wan çalakiyên wiha dikarin bi tenê ji ber bêbawerîya kor a bi Pirtûka Pîroz a nû derdikevin.

Li Îngilîstanê alîgirên Owen li ber çartîstan, li Fransayê jî Fourierîst li ber “Reformistes” [Reformvanan] radibin.

---

1 Phalanstères: Li gori plana Charles Fourier komoleyên sosyalist. [Têbîna Engelsî]

2 Îkarya: Cabotî pêşî utopyaya xwe, piştê jî komeleya xwe ya Komunist a li Amerîkayê wekî Îkarya navand. - [Têbîna Engelsî]

## HELWESTA KOMUNÏSTAN A LI HEMBERÏ PARTIYÊN DIJBER ÊN CIHERENG

Beşa II'yemîn t kiliy n komunïstan  n bi partiy n h y  y n  na karkeran, m na  artist n li İngilïstan    Reformvan n li Fransay , a kera kirin.

Komunïst ji bo gihïştina armanc n n z k   ji bo xurtkirina berjewendiy n dembor  y n  na karkeran t diko n. L bel  ew di nav tevgera iroy n de pa eroja v  tevger  j  dinim nin   l  dinih rin. Li Fransay  wan li dij  burj vaziya kevneperest   rad kal bi Sosyal-Demokratana<sup>1</sup> re tifaqek   kiriye; l bel  digel v  yek  li hember  gotin n bi t mt rak    a itiy n kevne op  y n ji  ore a Mezin m ratmay  dev ji maf n xwe y  girtina helwesteke rexney  bernadin.

Li Sw srey  ew pi tgir  didin Rad kalan; l bel  w  rastiy  ji b r nakin ku ew part  ji heman n dijraber -qismen bi wateya li Fransay  ji Sosyalist n Demokrat, qismen j  ji burj vaziya rad kal- p k t .

Li Polonyay  pi tgir  didin w  partiya ku  ore eke  andiniy  wek  mecra yekem n a rizgariya netewet  dib ne   li ser v  yek  p kol  dike. Serhildana Krakow (1846) ji aliy  v  partiy  ve hate ge kirin.

Gava ku burj vaz  li Almanyay  li dij  key tiya mutleq, m r tiya feodal   burj vaziya bi  k bi awayek   ore ger  tevdiqeriya komunïst j  her tim p  re t ko yan.

L bel  wan tu caran, keliyek be j , dev ji ron kirina  na karkeran bernedan. Wan her tim dijraberiya neyar  ya di navbera burj vaz    proleteriyay  de bi awayek  her  zelal di ser  karkeran de ni iland; da ku karker n Alman bikaribin wek   ekek  li dij 

1 W  dem  ew part  li parlamentoy  ji aliy  Ledru-Rollin ve, di literat r  de ji aliy  Louis Blanc ve, di  apemeniy  de j  ji aliy  rojnameya Reform  ve dihat nimandin. Nav  Sosyal-Demokrasi bi van dah ner n xwe re ni an  be eke ji Partiya Demokratik an Partiya Komarpar z- w  be a ku reng  sosyalizm  k m   z de li xwe kiriye- dida. [T b na Engelsi]

burjûvaziyê, li dijî mercên civakî û siyasî yên ku burjûvazî bivê nevē bi serdestiya xwe re tîne, sûd jê bibînin ku piştî hilweşandina çînên paşverû li Almanyayê têkoşîna rasterast a li dijî burjûvaziyê zûzûka dest pê bike.

Bi hîmî komunîst bala xwe didin Almanyayê. Ji ber ku ev welat di sihara şoreşeke burjûva de ye. Bi ser de jî ev şoreş bivê-nevē dê di mercên zêdetir pêşketî yên şaristaniya Ewropayê de û bi proleterya-yeke ji ya Îngilîstana sedsala hevdehemîn û ji ya li Fransaya sedsala hejdehemîn zêdetir pêşketî bê pêkanîn. Her wiha şoreşa burjûva ya li Almanyayê dê bibe destpêka şoreşeke proleteriyayê ya ku dê hema li pey wê pêk were.

Bi kurtasî komunîst li her derê li dijî pergala heyî ya civakî û siyasî piştgiri didin hemû tevgerên şoreşger.

Ew di van hemû tevgeran de, wê demê çiqas pêşketî be bila bibe, pisrgirêka xwedaniyê wekî pirsgirêka sereke derdixin pêş.

Komunîst veşartina raman û armancên xwe nagirin. Bi aşkerayî diyar dikin ku ancax bi hilweşandina bi darê zorê ya hemû mercên heyî yên civakî ew dikarin bigihîjin mebestên xwe. Bila çînên serdest ji ber tirs û xofa şoreşeke komunîst bilerizin. Ji xeynî zincîrên wan tiştêkî proletaran nîn e ku winda bikin. Wan cîhanek heye ku bi dest bixin.

*Karkerên hemû welatan, bibin yek!*



"Xeyaletetek li Ewropayê digere: Xeyaleta Komunîzmê. Hemû desthilatdarên Ewropaya kevn –Papa û Çar, Metternîck û Guîzat, Radîkalên Fransîz û sîxurên polîsên Alman– di navbera xwe de tifaqeke pîroz çêkirin, da ku vê spêleyê biqewitînin.

Ma partiyeke muxalîf heye ku ji aliyê dijberên xwe yê desthilatdar ve wekî komunîst nehatibe tawanbar kirin? Û partiyeke muxalîf heye ku wê mora komunîstiyê hem ji partiyên dijber ên ji xwe zêdetir pêşketî re hem jî ji neyarên xwe yê paşverû re bi berepaş ve nepekandibe? Ji vê rastiyê du encam derdikevin holê:

1. Komunîzm ji niha ve ji aliyê hemû desthilatdarên Ewropayê ve wekî hêzekê tê pejirandin.
2. Êdî wextê wê yekê ye ku divê komunîst dîtin, raman, armanc û dilxweziyên xwe li ber hemû cîhanê bi awayekî aşkere biweşînin bi manîfestoyeke partiya xwe bersiva vê çîroka spêleya Komunîzmê bidin."

